

welat

Civîna
sê
dagirkeran



Rûpel 5

Sal:1 - Hejmar:40 22-28 Mijdar 1992 5000TL (KDVD) Rojnameya Hefteyî

*Bi mebesta tesbîtkirina delegeyên
Meclîsa Neteweyî, gelê Kurd
hîlbijartinê çêdike*

Ji bo meclîsê gava yekemîn

Di navbera 20-22'yê Mijdarê de, bi mebesta tesbîtkirina berendamên nûneriya Meclîsa Kurdî, hîlbijartina delegeyan çêdibe. Kesên wek berendam beşdarê hîlbijartinê dibin, wê bibin delege. Ev delegeyên bîn tesbîtkirin jî wê rojên 6-7'ê Kanûna 1992 an beşdarê hîlbijartina nûneriya Meclîsa Neteweyî bibin û bi rayên xwe wê 15 nûnerên Meclîsa Neteweyî hîlbijêrin.

Di dîroka Kurd û Kurdistanê de cara yekemîn bi beşdariya delegeyên ji çar parçên Kurdistanê ji bo damezirandina Meclîsa Kurd a Neteweyî, hîlbijartina delegeyan wê li dar keve. Ev meclîs bi her awayî ji Meclîsa Kurdistanê Başûr cihêreng tê qebûlkirin. Ji ber ku ev meclîs, hem wê çar parçeyên Kurdistanê temsîl bike, hem jî wê bi tu dewletên împeryalist û dagirker ve ne girêdayî be.

Rûpel 8



Ji Theo re
name

Van Gogh

Rûpel 13



Mebûsên
HEP'ê ji bo
demokrasiyê
birçî ne!

Rûpel 9



Ev çûyîn
têkçûyîn e!

Rûpel 7

REWŞ



Abdullah Keskin

"Tekzîb"

Berî niha gelek caran em li ser sekinîn. Pêwist bû, dîsa em li ser disekinin:

Li welatê me, di nav me Kurdan de hinek norm (adet) rûneniştin e. Însanên me hê jî ne bi serên xwe difikirin. Serî û raman her yek li deverekê ne. Kesayatiya me Kurdan temirandin e. Weke zarokê biçûk em radibin ser xwe û ji nû ve dest bi meşê dikin.

Li ser riyê dirêj in em. Mesafeyê gelekî dûr heye di navbera me û civakên din de. Ji hinek aliyên ve heta em bigihêjin wan û mesafeyê bigirin emê zehmetiyên bikîşînin.

Zehmetiyên her destpêkê hene. Lê baweriyaya me bi me heye. Hem baweriyaya me bi me heye û hem jî, ji wê pê ve tu rê nîn e.

Xwendevanên me tu elaqe van tiştên ku me li jor nivîsî, bi sernivîsê re nabînin. Ne neheq in lê elaqe wan heye.

"Tekzîb" jî weke gelek tiştên din, di lîteratûra me Kurdan de hê bi cih nebûye. Sazgehên me bi xwe jî hê rûneniştine, heta çênebûne, qaîdayên wan wê çawa berî wan çêbibin û rûnên?

Mirov dikare ji her tiştî re kirasekî teorîk çêbike an jî bibîne. Ne çare ye, teng e, dirêj e an jî kin e. Ji ber wê yekê jî herdem em li ser rewşa xwe, rewşa welat, gel, dirok û her tiştên xwe disekinin. Em çavên xwe ji rastiye re nagirin û her rastiye li gora rewşa xwe ya subjektîf natewinin. Em vê dibêjin: Teoriyên ku ji derve îthal dibin tenê, bi serê xwe ne bes in.

Hê jî di gelek aliyên de em qaîdeyên klasîk pêk naynin. Hê jî rojnamegeriya me naşibe rojnamegeriyê. Şiira me çiqasî şîr e, nivîskarên me çiqas nivîskar in, divê em ji xwe bipirsîn, ji hevdu bipirsîn. Weşanên me çiqas dişibin weşanan? Mirov dikare van pirsan duvdirêj bike. Weke van, "tekzîb" ên me Kurdan jî naşibin tekzîbên tu kesî. Kesên herî demokrat çiqas rexneyên objektîf dikin û ji rexneyan re vekirî ne?

Ji bo hinek nivîs û xeberên me jî heta niha gelek "tekzîb" hatin. Ez tekzîbê di nav neynokê de dinivîsim, ji ber ku tiştên

Mirov dikare ji her tiştî re kirasekî teorîk çêbike an jî bibîne. Ne çare ye, teng e, dirêj e an jî kin e. Ji ber wê yekê jî herdem em li ser rewşa xwe, rewşa welat, gel, dirok û her tiştên xwe disekinin. Em çavên xwe ji rastiye re nagirin û her rastiye li gora rewşa xwe ya subjektîf natewinin. Em vê dibêjin: Teoriyên ku ji derve îthal dibin tenê, bi serê xwe ne bes in.

bi navê tekzîbê tînin tu elaqe wan pê re nîn e.

Bi taybetî dixwazim li ser du tekzîban, ji van bisekinim. Yek jê ya Abdurrezzak Fehîfî, ya din jî ya mebûsê Batmanê yê SHP'ê Abdulkarim Zilan e.

Amed Tîgrîs di hejmara 30'an de bi navê "Ev çawa Kurdperwerî ye, çawa politîka û diplomasî ye" nivîsek nivîsibû û tîkiliyên PDK-YNK'ê û Tîrkiye rexne kiribû. Radyoya Tîrkî Merhaba li Swêdê

li ser Kurdan programek çêkiribû. Berpirsiyarê YNK'ê Abdulrezaq Feylî di programê de aqil dide Tîrkiyê. Dibêje: "Divê hûn hemû grubên Kurdan ên derî PKK'ê bikin yek û ji wan re îmkanan çêbikin û wan bibine welêt. Heqê ziman û kulturî bidine wan. Wan li welêt biparêzin. Wê demê PKK namîne..."

Piştî wê nivîsê A.Feylî nameyê tuj ji me re şand. Amed Tîgrîs di nivîsa xwe de hinek ji gotinên wî îqtîbas kiribû. Feylî dibêje: "Gotinên ku Tîgrîs li ser navê min gotine ne rast in." Lê behsa axaftina xwe nake. Dibêje ev tiştên ku li ser navê min hatine nivîsîn tu elaqe min bi wan re nîn e. Lê nabêje "Min ev ev tişt gotiye û axaftina min a rast jî ev e."

Em tu caran naxwazin pişgirî şexsî bigirin. Gotinên Feylî di rûpela Welat de wek "tekzîb"ê derketin. Piştî "tekzîb"ê ji Stockholmê gelek xwendevanên me geriyên. Gelek însana guhdariya A.Feylî kiribû. Heta dengê wî qeydî qasetê jî kirine.

Herkes bi listikên van camêran dizane. Her tiştên bi gemar dikin û înkâr dikin. Lê herkes dizane.

Ev politîkvanên me yê modern hez ji şantajê jî dikin. Li dawiyê dinivîsin: Ger hûn di hejmara pêşî de çap nekin emê di hin cihên din de bidin weşandin. Em ne qurteyan, tekzîbê dixwazin. Ger tekzîb be kî bişîne bila bişîne emê çap bikin.

Yek ji van tekzîbên ku naşibe tekzîban jî Mebûsê Batmanê yê SHP'ê Abdulkarim Zilan şand. Li ser nûçeya "Mebûsê Tîrşîkçî" jî ber çî ji SHP'ê venaqetînin" nivîsiye. Zilan xwe bi hinek peyvên girover diparêze. Di nûçeyê de hinek îdîa hatine nivîsîn. Li ser van nasekine. Bersiva pirsan nade. Ji wê yekê jî me çap nekir.

Kesin jî dixwazin dawê vekin di heqê me de. Riya mehkemeya ji wan re vekirî ye.

Me hêviyên xwe wînda nekirine. Rojê ev norm we liba me jî bi cih bin

FERHENGOK

- Aşpêj: (aşçı)
- Berfireh: Dorfireh (geniş, yaygın)
- Berfirehî: Dorfirehî (genişlik)
- Bi berfirehî: Bi dorfirehî (genişçe, yaygınca, etraflıca)
- Cawbîr: (makas)
- Ciyawazî: Cihêbûnî (ayrılık)
- Çewt: Xelet, nerast
- Çewtî: Xeletî
- Gewr: Boz
- Gurçîk: (böbrek)
- Dorhêl: Derdor (etraf, çevre)
- Gulav: Kolonya
- Hesinger: Hedad, hesinker
- Jêbir: (silgi)
- Jêder: Çavkanî, jêza
- Kesax: (budama)
- Liq: Çiqil, şax, branş
- Margîsk: (kobra, engerek yılanı)
- Marmasî: (yılan balığı)
- Navçe: Herêm (bölge)
- Neynik: Eyne (ayna)
- Neynûkbîr: (turnak makası)
- Pars: (dilenme)
- Parsek: (dilenci)
- Parskirin: (dilenmek)
- Pênivîs: Pênûs (kalem)
- Polat: Pola (çelik)
- Qelw: Xurt
- Rantiye: (asalak, parazit)
- Rastkêş: Cetwel
- Rawêj: Texmîn
- Rim: (mızrak)
- Rimandin: Hilweşandin, wêrankirin
- Rîz: Birinc (pirinç)
- Rîstandîn: Bi rêz kirin (dizmek, dizgi yapmak)
- Sereke: Bingehîn (başlıca)
- Xatem: Gustîl
- Xwas: Pêxwas, pêtazi
- Xizem: Xizme (hızma)
- Xeydok: (darılğan)
- Zewade: (azık)
- Zeximandin: Saxlem kirin
- Ziryay: Bahoz (poyraz, kar fırtınası)

Gelo dîsa çî bû?

Faxîr Mamedî

Careke din li bajarê Berlînê cumhûriya çepel a Îslamiya Îranê destê xwe yê gemarî dirêjî rêberê me yê hêja Dok. Mihemed Sadiq Şerefkendi û çend hevalên dilsoz kirin û ew qetîl kirin. Du sal berê jî li bejarê Wiyanyê paytexta Utrîşê (Avusturyayê), rêberê me yê delal Abdirehman Qasimlo şehîd kirin. Komara terorîstperwer a Îranê, bi wan planên xwe yê qirêjî dixwaze şoreşa gelê Kurd bide rawestandînan an jî hilandin. Diyar e ku Komara Îslamiya faşîst hê jî nizane ku gelê Kurd bi şehîdketinan hin bêhtir şoreşa wan gurr dibê û didome. Di tarîxê de diyar bûye ku gelê Kurd, bi şehîdketina rêberên xwe ranaweste û her tim şer û cenga xwe kirine.

Ji ber ku ev raman û hedef ji gelê Kurd re diyar bûye û herkes jî zane ji bo ku em welatê xwe yê delal ku di bin destê dijminan de ye derxin, şer dikin.

Dijmin jî dixwaze wê qetîlîkirina Dr. Sadiq Şerefkendi bixwe stuyê PKK'ê. Televizyonên Tîrk gotin ku "reberê P.D.K. a Îranê PKK kuştîye."

Ev plana han pîrr kevn e ku dewleta Tîrk dixwaze pê gelê Kurd berî hev bide.

Em zûtir ji hemû kesên pêşverû yê Kurd dixwazin ku zûtir wê xebera hana derew a Tîrk û Îranê îlan bikin ku gelê Kurd ên paşmayî jî wê planê bawer nekin.

Dijmin dixwazin bi yek fişekê li çend nişanan bixin.

1. Kêmkirina zanyar û şexsiyetên girîng ên Kurd.

2. Bêhalxistin a hêzên pêşmergeyan û bêhêvidarkirina wan.

3. Bi hevexistina Kurdên Îranê û Kurdên Bakûr.

4. Di nav neteweyên cîhanê de xwestekên Kurdan bidin rawestandînan. Ku bibêjin gelê Kurd bi hev re ye, yek nîn in. Û doza Kurdistanê bidin paşxistin. Rûreşî bo dijmin e kevnepe-rest a komara ku diji heqî û merivheziyê ya faşîsta Îslamiya Îranê. Ne mirin jî bo şehîdên Kurd û Kurdistanê. Hezar silav bo canê paqij Doktor Mihemed Sadiq Şerefkendi û hevalên wî.

Bijî doza heqperestiya gelê Kurd.

Bimire komara kevnepe-resta Îslamiya Îranê.

Barekî giran!

Endamên redaksiyona kovara hêja "Welat"

Silavên germ bo we.

Îro min kutakir jimara çaran ji kovara we yê ku gihîştine destê min li vir, li bajarê "MONTREAL" li Kanada, kêfxweşiya min bi wê kovarê bê sinor bû, çimkî li wê derê dîrketineke mezin heye ji çand û wêjeya Kurdî. Hûnê bawer nekin ku Kurdên dizanin bixwînin û binivîsin bi Kurdî li ser tiliyan tînin jimartin û ew jî belavkirî ne li gelek bajarên. Ji ber wê yekê ez diwarîyeke mezin li ber xwe dibînim di anîna kesekî ku li min guhdariyê bike, bide û bistîne li gel min.

Bêhtirî deh salan, min zimanê Kurdî ji xwe re dîtiye wekî xweştirî, girîngtirîn kar, ji mêj ve ez helbestan dinivîsim û dixwînim bo kamên dostan û hogîran, du caran li bajarê "Moskov" cihê ku min lê xwendin kuta kirî, min du pirtûkên biçûk ji helbestan û yek kom ji kurteçîrokan û dawî şanewereke nedirêj min deranî bi alîkariya hevalên li hawîr min, bê guman bi jimarekê hindik. Hîn ez nabînim (nivîskarek)! Lê bo min nivîsandina kul û derdên miletê

xwe bareke divê bi dilrastî û dilsozî ez hilgirim.

Gihîştina kovara we bo min bi awakî peryardîk tiştêkî zor girîng e, çimkî ev kovar wê bibe bo min rodanka yekemîn li derve piştî dîrketina min î çend mehan ji çapemeniyên Kurdî. Ez hêvidar im hûnê karibin wê kovarê bo min bişînin û bê guman ez hemû berhemên xwe ji we re bi rê bikim nêzik bi hêviya ku ew pêwist bin ji bo ku riya xwe di çapê di bibînin.

Bê guman ezê hin kêfxweş bim eger hûn alîkariya min bikin, bi nixên xwe û rêzaniya xwe. Wiha jî ez dixwazim, ji we re bêjim ku hindik xebata min hebû di warê rojnamevaniyê de, di çêkirina planatan û dîzana hunermendî de. Ezê herdem kêfxweş bim, alîkarîya we bikim, bi hemû awayî. Tenê divê em di gel hev dilsoz û berpirsiyar bin... Û bi ciwanmêrî û bira-sozî û bi yek dest bi hev re bin.

Tenê yekîtiya me hemûyan we me bi ser xîne

Ez dixwazim hûn min bibînin wekî endamêkî ji kombîna kovarê û ezê li hêviya pêşniyariyê we bim.

Hemîdê H. / Montreal



Seyîd Rîza, Serokê Serhildana Dêrsimê piştî 55 salan îro çiya, gund û bajarên Kurdistanê tijî Seyîd Rîza bûne.

Piştî 55 salan ji nû ve Seyîd Rîza

Serekê serhildana Dêrsimê Seyîd Rîza, piştî 55 salan, ji nû ve di nav gelê xwe de şin da û dardekirina wî bi livbaziyên girseyî hate protestokirin.

Di sala 1937 an de, Seyîd Rîza û hevalên xwe, ji alî hêzên dagirker ve hatibûne girtin û di 18'ê meha Mijdarê de ji wan dardeki-

ribûn.

Lê îro, gelê Kurd vi Serokê mezin û Serhildana Dêrsimê bi serhildanên nû pîroz dîke û her di riya wan de dimeşe.

Li Dêrsimê, Ovacixê û Mazgirtê, gel bi beşdariyê mezin dardekirina Seyîd Rîza û havalên wî protesto kirin. Esnaf, dikanên

xwe girtin, şofêr mifeyên erebên xwe radan û xwendekar ji neçûn dibistanan.

Piştî 55 salan, ev cara yekemîne ku bi aweyekî girseyî Seyîd Rîza tê bibîranîn.

Ev livbazî, bi banga serokatiya ARGK'ê ya Eyaleta Dêrsimê pêk hatin.

Bûyerên hefteyê

12.11.1992- Gerilayan êrişî ser beraja Batmanê kirin. Depoya dinamîtan teqandin, inşecata berajê gelek xesar dit. Pişt re ji di nav gerilayan û leşkeran de şer derket, leşkerek hate kuştin.

Di navbera Kerboran û Midyadê de gerilayan kemîn danîn ber qonvooye leşkeran, du leşker kuştin û didu ji birindar kirin. 2 panzer ji imha kirin. Li Kercewsê (Gerçüş) li gundê Cimilînê gerilayan cerdevanekî kuştin. Li Sasonê li gundê Tekewler 2 cerdevan ji alî gerîla ve hatin revandin.

13.11.1992- 4 cerdevanên ji Qilabanê li Haftanînê pêl mayîna gerilayan kirin, mirin. 2 ji birindar bûn. Li Ixdîrê gerilayan bombe avêtin ser mala faşistekî ku gule reşandibû ser gel. Li Hîzanê gerilayan qereqol û mekteba gundê Hîşetê şewitandin.

14.11.1992- Li Erzeromê di navbera gerilayan û hêzên dewletê de şer derket, astubayek û 5 leşker hatin kuştin, 21 gerîla ji hatin kuştin. Li Dêrsimê, li navçeya Mazgirtê li nêzikî gundê Taştan, di navbera gerilayan û leşkeran de şer derket. 6 leşker hatin kuştin.

15.11.1992- Li Batmanê gerilayan êrişî ser navçeya Hezo (Kozluk) kirin. Êrişa gerilayan saetek dom kir. Di vê saetekê de gerilayan avahiye dîwletê dan ber roketavêj û guleyan. Avahiye dîwletê gelek xesar dîtin. Li navçeya Çelê (Çu-

kurca) li nêzikî gundê Çayırli, erebeya leşkeran pêl mayîna gerilayan kir, 4 leşker mirin. Li Başûrê Kurdistanê li herêma Zapê leşker ketin kemîna gerilayan, 20 leşker hatin kuştin.

16.11.1992- Li Bedlisê li navçeya Motkê gerilayan li pêşiya qonvooya leşkeran kemîn danî, 4 leşker kuştin, 7 ji birindar kirin. Li Şemrex (Mazîdağ) 6 cerdevanên ji gundê Grësor ku diçûn nobeta qereqolê, ji alî gerilayan ve hatin kuştin. Li navçeya Stewrê (Savur) li gundê Cewzê û Bakustanê di nav gerilayan û hêzên dewletê de şer derket. 3 cerdevan û 3 tîmên taybetî hatin kuştin. Ji gundê Kocahöyük ji meleyê gundê cerdevanek ji alî gerilayan ve hatin kuştin. Li Mêrdînê, gerilayan êrişî ser navçeya Qosarê (Kızıltepe) kirin. Avahiye dîwletê dan ber gule û roketavêjan, avahî gelek xesar dîtin.

17.11.1992- Di navbera Cizîrê û Nisêbinê de qonvooye leşkeran ket kemîna gerilayan, leşkerek hate kuştin. Li Wanê li navçeya Gewaşê gerilayan avêtin ser gundê Tûrelî, mekteba gundê inşecata qereqolê şewitandin. Li Agiriyê li navçeya Bazîdê, 2 xayin ji alî gerilayan ve hatin kuştin. Li Amedê li navçeya Pîranê (Dicle) 2 hizbî-kontra ji alî gerilayan ve hatin kuştin. Li Farqînê, hizbî-kontra hêz hatê kuştin. Gerilayan di navbera Batmanê û Farqînê de rê birrîn. 700 erebe se-

kinandin, propaganda kirin û 4 erebeyên TPAO'yê şewitandin.

Li navçeya Dîgorê û li navçeyên Gewer (Yüksekova) û Navşan (Şemdinli) kepenk hatin girtin. Weke ku nûçeyên daxuyaniya Qerergeha ARGK'ê ya Serhedê ku digot "ji bo bûyerên ku li Ixdîrê çêbûn kepengên xwe bigirin" esnafên Dîgorê dikanên xwe girtin. Û bûyerên Ixdîrê protesto kirin.

Li Gewer û Navşanê jî, li dijî êriş û zilma dewletê û ji bo destekkirina mebusên HEP'ê yên ku di greva birçîbûnê de bûn. Esnafên her du navçeyan dikanên xwe girtin û qontaxên erebeyên xwe qefaltin. *

18.11.1992 - Li Dêrsimê û li navçeyên wê, Ovacîk û Mazgirtê, li ser belavoka Qerergeha ARGK ya Dêrsimê, esnafan dikanên xwe girtin. Ev bûyer û belavoka ARGK'ê jî bo protestokirina salvegera qetilkirina Serokê Serhildana Dêrsimê Seyîd Rîza bû. 55 sal berê ji alî dewletê ve hatibû qetilkirin. Beşdariya ve livbaziyê li Dêrsimê û li her du navçeyên wê di sedî sed bû.

Li Şîrnexê li navçeya Şenoba, li nêzikî herêma Bestayê gerilayan kemîn li ber qonvooya leşkeran danîn. 2 leşker kuştin, gelek ji birindar kirin.

Li Ixdîrê li navçeya Aralık'ê, di navbera gundên Golikent û Adetli de, di navbera-hêzên dewletê û gerilayan de şer derket, leşkerek hat kuştin 5 ji birindar bûn.

Dewlet li hundir qetlîaman dimeşîne

Kurdîstana bakur, ji bo dewleta Tirk, piştî dehan salan ji nû ve, dîsa bûye herêma qirkirin û koçberkirinê. KT (TC) li bernameya xwe ya tunekirina serhildana gelê Kurd, şerek bi gêmê û dorfirêh dimeşîne. Îro ji zarokên dergûşan heta 90 saliyên Kurd, hedefên leşkerên Tirk in. ne tenê mirov, lê dar û ber, çiya û zevî, heywanên kûvî û kedî jî, ji vî qirkirinê nesîbê xwe distînin.

Dewleta Tirk, piştî ku bi Eniya Kurdistanê re, êrişî ser bargehên PKK'ê kir û bi vî êrişê tu tişt bi dest nexist, ji bo xwe serfiraz nîşan bide, dest bi beyanên derew û bi navgîniya rojnameyan, belavkirina nûçeyên nerast kiribû.

Dewlet bi piştevaniya van derewan, hin daxuyanî belav kiribûn. Li gor-van daxuyaniyan, dewlet li Başûrê Kurdistanê, serfiraziyeke mezin bidest xistibû, piştî gerîla şikandibû û niha jî dor a hundir bû.

Lê, weke ku tê zanîn, dewlet herdem bi gerîla re, ji şerê rûbirû direve, ta mecbûr nebe dernakeve ser riya gerîla. Lewre ji bo wan, hedefên hêsantir hene. Dewlet, rêlibergirtina têkoşinê, di qirkirina gel de dibîne. Ji Osmanîyan heta îro, ev politikayên wan neguherîne. Jixwe, mebesta KT'ê, ji beyana paqijîya hundir jî, ev e.

Ordiya Tirk, îro bi hemû hêzên xwe, di qirkirin û wêrankirina Kurdistanê de ye. Li Pîrana-Diyarbakir, li Mûşê li Mêrdînê, li Cizîrê, li Kerboranê... û li gelek deverên din, bi dehan gund û navçe, piştî beyanên "paqijîya hundir" bûn hedefên leşkeran û bi dehan kes hatine kuştin.

Li Stewrê, gundê Bakustan jî, bû hedefa tanq û topên leşkeran. Piştî şerê di nav gerîla û leşkeran de, hêzên dewletê berê xwe didin gundê Bakustan û bi gul-lebarana roketan 7 malê gundiyan tene xerakirin. Dawî leşker û cerdevan dikevin nav gund û êrişî ser malan dikin. Zilamên gund hemû bi lêdan û îşkence ji malan dûr dikin û dest davêjin namûsa keç û jinên Kurd. Cerdevan û leş-

ker, tecavuzê 2 keç û 2 jinên Kurd dikin. Gelek ji zilamên gund jî bi xwe re dibin. Yek ji van gundiyan A. Latif Aydın, bi lêdanê dixine komayê û di nav betaniyekê de bi xwe re dibin.

Leşker û tîmên hov û har, ev ne cara yekemîne ku dest davêjin namûsa Kurdan, wê ne cara paşî be jî. Lê wê nikaribin xwe ji vî tewanê (sucê) xelas bikin.

Dê ew jî, mîna leşkerên Hitler û dagirkerên mijokdar, bi van tewanên xwe bi bîr werin û elbet mîna yên berî xwe, wê di xwîna ku dirêjin de bifetisîn.

DOR A AVAHİYÊN KURDÎ YE

Dewlet, bi êrişên ser gund, navçe û bajarên Kurdistanê re, berê xwe da ser saziyên Kurdî û komeleyên demokratîk jî. Li Stenbolê, roja 15 Mijdar 1992 an de, polis bi fermana Mehkemeya Ewlekariya Dewletê (DGM), bi ser Enstîtuya Kurdî ve girt. Di vî êrişê de, 3 kes ji xebatkarên Enstîtuyê û 2 mêvan, ji alî polîsan ve 3 rojan di bin çav de hatine girtin û li wan tade kirin. Polîs gelek pirtûk û dokumentên Enstîtuyê jî bi xwe re birin.

Dawî dest danîn ser çend dîsketên detayê (bilgîseyarê) yên mayîn jî, ji paş ve dan.

Li ser navê Enstîtuya Kurdî, Huseyîn Kaytan ku di komîsyona zîmnan de kar dîke wiha got: "Em vî êrişê wek êrişêke ku li şexsan hatibe kirin nanirxînin. Ev êriş, raste rast li ser saziyek Kurd hatiye kirin. Dewlet bi qala "paqijîya hundir" ve, dest bi operasyonêke fireh kiriye.

Enstîtu, saziyêke ilmî ye û di sazûmanbûna Kurdî de, gavê yekemîne. Lewre yê ku dewlet, dixwaze Enstîtuyê pasîfîze bike. Li hember raya dinyayê girtina Enstîtuyê nikarin bixin rojeva xwe, ji ber vî jî dixwazin ji Enstîtuyê tu kar dernekevin û tu xebat neyên kirin.

Em vî operasyonê, bi operasyona "paqijîya hundir" ve girê didin û parçeyek ji bernameya tunekirina serhildana Kurd dibînin, lewre jî protesto dikin."

Dîsa û ji nû ve sosyalîzm


Murat Ergin

Di nav van 45 salên dawî de li dinyayê serûbinbûyînen mezin çêbûn. Sîstema Sovyetê ya Sosyalîst hilweşiya, sîstem ketin nav hev, welatên di nav Yekîtiya Sovyetê de, bi pêşengiya burjûwayên xwe yê nû ve ji Yekîtiyê veqetiyên û serbixwe bûn. Li Rojhilatê Ewropayê jî welatên sosyalîst ku, bi her awayî bi Yekîtiya Sovyetê ve girêdayî bûn li pey hev, dev ji sosyalîzmê ber dan û deriyê welatên xwe ji sîstema kapîtalîst-împeryalîst re vekirin. Di warê ekonomiyê de û di tîkiliyên mirovahiye de politîkayên kapîtalîst ên piyaseya serbest meşandin. Bi rastî bi listikên CIA'yê û bi derew û propagandayên ku qala delaliya kapîtalîzmê dikir, burjûwaziya van dewletan gelên xwe xapandin û kirin ku li dijî welatfiroşiyê û kedxwariyê gel deng xwe dernexe. Di demeke

kin de burjûwazi di van politîkayên xwe de serfiraz ji bû. Lê şahiya hêzên burjûwayan pirr dom nekir. Li welatên ku ji sosyalîzmê dageriyan, reaksiyonên gelan ên li dijî sîstema kapîtalîst û tîkiliyên wê xwe di hîlbijartinan de nîşan da. Pêşî li Moxolistanê, bi şûn ve li Romanya û îro jî li Lîtvanyayê hîlbijartinên ku çêbûn bi serfiraziya sosyalîstan xelas bûn. Gelên van welatan di pêvajoyê de, qirêjiya tîkiliyên kapîtalîst dîtîn. Dîtîn ku kapîtalîzm ji xeynî feqîriyê, kedxwariyê û dijminatîya gelan pê ve tiştek neanî. Ji ber vê yekê, di hîlbijartinan de, di van welatan de gelan bi programên kapîtalîst îtibar nekirin. Û dîsa ji nû ve ray û hêviyên xwe bi programên sosyalîstan ve girê dan.

Weke ku tê zanîn Lîtvanya welatê yekemîn bû ji welatên ku ji Yekîtiya Sovyetê veqetîya bûn. Lîtvanya 45 salan ji bo ji Yekîtiya Sovyetê veqete di bin

serokatiya serokê Partiya Sajudis, Vitautas Landsbergis tîkoşîn dida. Di dawî de, di sala 1991 an de di meha Îlonê de ji Yekîtiya Sovyetê veqetîya, serbixwe bû. Û Langsbergis û partiya wî jî bûn hikûmet. Lîtvanya herçikas serbixwe bûbe jî, ji alî ekonomiyê ve hê jî bi Rusyayê ve girêdayî ye. Bi taybetî jî di warê senayî, enerjî û petrolê de. Serokê Lîtvanyayê Langsbergis, hat ne hat hikûmetê dest bi ekonomî politîkayên xwe yên kapîtalîst kir. Lê piştî ev politîkayên ekonomîk ên kapîtalîst dest pê kirin, di nava salekê de encamên xwe jî nîşan dan. Enflasyon roj bi roj zêde bû, her tişt zêde buha bûn, karkeran jî kar avêtin, bêkarî zêde bû, hilberîna (ûretim) eşyayên senayiyê roj bi roj kêm bûn. Û gel ji vê rewşê ne kêxweş bû. Belê roja ku di 15 Mijdar 1992' an de hîlbijartin çêbû, Lîtvanya di rewşeke wisa de bû. Vikautas



Her çiqas dîtînen partiya komunist a berê, bi temamî neparêze jî, karkirina Vytautas Landsbergis, nîşan dide ku gelê Lîtvanya hê vêga jî kapîtalîzmê kerixiye.

Landsbergis, bi hêviyên mezin hatibû ser kar. Lê bi encamên politîkayên wî yên kapîtalîst re, baweriya gel êdî jê re ne-

mabû. Ji ber vê yekê jî, di vê hîlbijartinan 15'ê Mijdarê de wînd kir û ew û partiya wî, ji hikûmetê ketin. Pêşîya 15 Mijdarê jî, li Lîtvanyayê di 25 Cotmeh 1992 an de hîlbijartineke din çêbûbû. Lê di vê hîlbijartinê de her du partî (yek ji van partîyan Partiya Komunist ya berê ye ku bi navê xwe yî nû Partiya Karkeran a Demokratîk e. Ya din jî Partiya Sadujis e ku bi Serokatiya Landsbergis di hikûmetê de ye.) ji bo hikûmetê damezirînin tîr ray nesitandibûn. Li Lîtvanyayê, ji bo partiyek were iktîdarê divê ji 141 sendelyeyî, 71 sendelye qezenç bike. Ji ber vê yekê di 15'ê Mijdarê de hîlbijartineke din çêbû. Di vê hîlbijartinê de gel rayên xwe dane programa komunistên berê ku vêga di nav Partiya Karkeran a Demokratîk de ne.

Partiya Karkeran a Demokratîk nêzîkî 100 sendelyeyî qezenç kir û hate hikûmetê. Partiya ku hikûmet bû jî bi tevî itîfaqên xwe 40 sendelye qezenç kir û ji hikûmetê daket. Partiya Sajudis ku ya kapîtalîsta ye û serokê wê Vitautas Landsbergis, di vê hîlbijartinê de tîk çû. Lê ne tenê ew îdeolojiya wan jî, politîkayên wanî ekonomîk ên kapîtalîst jî, li ber çavên gel tîk çûn. Û bi vî awayî jî gel, dilgeşî û şahiya kapîtalîst û împeryalîstan di qirika wan de hişt.

GOTÎN

Yaşar Kaya



Seyadê Şamê

Kekê Seyad, mehek berê bédeng û bêhis çû rehetmetê. Hevalek ji min re got, nexwe ez hay jê nedibûm. Kekê Seyad, ji Bazîdê bû. Kurê Şamedîn Çamlîbel e, yanî kekê Xalis, Yilmaz û Weysel Çamlîbel e. Ev nêzîkî 50 salan e ku li Rûsyayê bû. Li wê derê dijiya. Kurteçiroka Kekê Seyad dirêj e. Kekê Seyad direve diçe Rûsyayê. Me gişan, Kekê Seyad, ji radyoya Êrîwanê dinasî. Dengbêjek gelek hêja bû. Di radyoya Êrîwanê de, klamên Kurdî digot. Klamên wî, klamên hêla me bûn. Ji Serhedê, klamên mêraniyê, klamên şer û klamên serhildanan digot. "Lo Apo" klama wî bû. Birayê Kekê Seyad, Xalis zavê min bû. Di van salên dawî de, ku çûyîn û hatina Rûsyayê zehf zor bû, wî pasaport

stand û çend caran çû Kekê Seyad dît. Kêkê Seyad par hatibû Stenbolê. Ez çûm, min wî li mala pismaman dît. Rojek jî hate cem min. Me gelek li ser camêrtî û biratiyê xeber da. Lê ez tîr nebûm. Piştî Stenbolê çû Bazîdê, çû welatê xwe. Çû çiqas heval û hogirê wî hebûn wan dît. Hevalê ku ji min re telefon kir, Weysel Çamlîbel bû, birayê wî yê biçûk. Ez

Radyoya Êrîwanê êdî nikare bibêje: "Gelî xwişk û birayên delal; niha Seyadê Şamê, wê ji we re, vê klamê pêşkêş bike". Lê belê, dengê Kekê Seyad, di guhên gelek Kurdan de ye. Ew di jiyana xwe de, ji bo Kurd û Kurdistanê gelek klamên xweş got. Divê Seyadê Şamê, di nav gelê Kurdistanê de, neyê jibîrkirin.

zehf bi ber mirina Kekê Seyad ketim. Weysel digot, "Roja ku Kekê Musa Anter kuştin, Kekê Seyad jî, ew roj miriye." Kî dizane, emê çi çaxê, li ku derê û çawa bimirin.

Belê mirin heq e. Kî ji bo gelê xwe çi bike, xebata wî bi çi rengî be, wê ew bimîne li dinê.

Berî êvarê, me radyoyê Êrîwanê vedikir. Li Qersê, li Bazîdê, Li Îxdirê, li Wanê û li temamê Serhedê dengê Kekê Seyad, mîna zengil, mîna ava zelal di hate guhên me. Dengbêjek bi nav û deng bû. Min par, pê re gelek xeber da. Zana bû, welatparêz bû. Kurdên li Bakur, ji ku hatibûne kuderê, bi çavê xwe dît. Piştî 30-40 salan hatibû welatê xwe. Xortên Kurdan dît, Kurdên li Stenbolê dît, jiyana wan dît, zehf dilxweş bû. Digot: "Bira, ev dinya we, jiyana we, qet naşibe jiyana me. Jiyana li Rûsyayê". Radyoya Êrîwanê êdî nikare bibêje: "Gelî xwişk û birayên delal; niha Seyadê Şamê, wê ji we re, vê klamê pêşkêş bike". Lê belê, dengê Kekê Seyad, di guhên gelek Kurdan de ye. Ew di jiyana xwe de, ji bo Kurd û Kurdistanê gelek klamên xweş got. Divê Seyadê Şamê, di nav gelê Kurdistanê de, neyê jibîrkirin. Li cem me dibêjin: "Axê ew kişandibû". Hate welatê xwe û mîletê xwe dît. Bila rehet razê.

Girtî li ber mirinê ne!

Li girtîgeha Elezîzê greva birçîbûnê ji diduyê Cotmehê ta niha ku dibe 51 roj ji aliyê 257 girtiyên siyasî ve didome. Her wiha ji bo piştigiriya girtî û dilên girtîgeha Mazrayê (Elezîzê), dil û girtiyên girtîgeha Dilûk (Entep), Amed (Diyarbakir), Meletê, Mêrdîn û Stenbol Sağmacılar ji vê grevê destek dikin û wan ji bi dorê dest pê kirine.

Weke ku tê zanîn girtî û bendiyên bendixana Mazrayê (Elezîzê) ji bo, ji holê rakirina mafên wan ên girtîgehê dest bi greva birçîbûnê ya bi dorê kiribûn.

Ev mafên wanên ku ji hole hatin rakirin hinek ji wan ev in.

- Nehîştina rojname, kovar û weşanên qanûnî bikevin hundirê girtîgehê.

- Nehîştina ku dîdevanên (ziyaretvanên) girtî û dilan bi xwe re xwarinê bibin hundir.

- Nepejirandina (qebûlnekirina) nûnerên siyasî ji bo girtî û mehkûman û hwd.

Ji bo ku dawî li vê greva birçîbûnê ya girtîgeha Mazrayê binin. Komeleya Mafên Mirovan bi Wezîrê Dadiyê (Edaletê) re ketiyê têkilyan. An ku Komeleya Mafên Mirovan navberitîyê dike û ji bo vê girtîgehê ji maf û heqên ku ji bo girtîgeha Bucayê derbasdar e, ji girtîgeha Mazrayê re ji ji Wezîrê Dadiyê dixwaze.

Sazî û weşanên demokratîk û pesta dewletê

Dewlet zilm û pesta xwe ya li ser gel û sazî û weşanên demokratîk didomîne.

Qala demokrasiyê, di devê rêvebirên dewletê de, bûye benîşt û dicûn. Hikûmet, bi propagandayên demokratbûnê tene ser kar û bi saya van gotinan tene hilbijartin. Lê desthelat tu car neketiye destê hikûmetan, lewre ordî vê orgaznîzasyonê di destê xwe de digire; ji hikûmetan re jî, peyatiya ordiyê dimîne û her bi fermana qumandan dilivin, an jî bê deng û his dimînin.

Komele, kovar û rojnameyên ku li dijî vê rejîmê di lebatê de ne, bi zilm û zoreke dijwar rûbirû dibin. Komele tene girtin, endamên wan di bin çavan de winda dibin û ji êrişên polîsan, bi tu awayî nikarin xwe rizgar bikin. Komeleya Mafên Mirovan (IHD) liqê Konyayê li gor van politîkayên dewletê, bi biryara walî hate girtin.

Der heqê gelek komeleyên din de jî biryara girtinê heye û li dû hev yek bi yek tene girtin.

Rojname û kovar, tene berhevkin, xwedî û berpirsiyarên wan tene girtin, nûçevan û nivîskarên wan jî, tene kuştin. Ji van rojname û kovarên muxalîf, Yeni Ülke, hema bêje bi berhevkirina hemû hejmarên xwe serî dikşîne. Rojnameya "Azadî", "Medya Güneşi" û kovara "Kurtuluş" û hwd. jî, ji vê pestê bê par namînin.

Civîna sê dagirkeran

Navenda Nûçeyan- Di 14 Mijdar 1992'an de li paytexta Tirkiye Enqerê, di "Ankara Pala" de Wezîrên Karê Derve yê Tirkiyê Hikmet Çetin, ê Iranê Ali Ekber Weleyatî, yê Sûriyê Tarik El Şara, li hev rûniştin û li ser pêşveçûnên herêmê bi hev şewirin.

Her çiqas li ser mijara "Bakurê Îraqê û pirsgerêka Sinor a Navwelatan" bi hev re rûniştin jî, rojeva wan gelemşa Kurdî bi xwe bû.

Ev dewletên dagirker û mêtîngehkar ên ku Kurdistanê di nav xwe de li hev parî kirine an di navbera wan de hatiye parîkirin.

Careke din ji bo rêliberigirtina tevgera Kurdî hatin cem hev. Ev dewletên ku ava wan di cokerê de naherike û dijberî di nav wan de hene, gava mesela Kurdî tê holê ji hev re dibişirin û weke ku qet di navbera wan de dijberî û dubendî nîn be bi hev re didin û distînin.

Ev dewlet tevî hevkar û hevalbendên xwe yê Împeryalist berê jî, ji bo rawestandina tevgera azadî ya gelê Kurd peymanan çêkiribûn, mîna peyman CEN-TO û peyman Bexdayê. Niha jî bi rêberitîya dewleta mêtîngehkar Tirkiyê, di sa dixwazîna peymaneke din çêbikin û qaşo bilindbûn û pêşveçûna şoreşa gelê Kurd bidin rawestandî.

Ev dewletên ku tu caran rûyê wan ji hev re nakene û gelemşeyên girîng ku di navbera wan de heye, ji ber xurtbûna û hêzdarbûna doza Kurdî lingên wan li hev dikeve, tevî xêrxwazên wan ve.



Wezîrên Karê Derve yê Iranê Ali Ekber Welayatî, ê Sûriyê Tarik El Şara û yê Tirkiyê "lawê xayîn" Hikmet Çetin ji bo planên nû bi hev re ne.

Ji bo Kurdan tu tiştê neguherî

Navenda Nûçeyan- Piştî demeke dirêj, Qanûnê Usûlî yê Dadgehên Cezayî (CMUK) ku, li serê gelek munaqesê di hate kirin û ji hêla Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal ve hatibû vetokirin, bi guherînê nû ve ji aliyê Meclîsa Tirk ve hate qebûlkirin. Heta li ser vî qanûnî di navbera partiyên koalîsyonê SHP û DYP'ê de dijberî deketibûn holê. Ev qanûn di nav raya giştî de bi navê "Reforma Darazî" dihat binavkirin. Li gorî vî qanûnî hinek rayeyên

(selehiyetên) Rêxistina Polîsan û Dadgehên Ewlekarî yê Dewletê tene qutkirin û hinek jî rewşa sîdard, girfî û kesên di bin çav de jî baş dibe. Guherînê ku di qanûn de çêdibin hinek jî wan ev in. Cezayên ku ji 7 salan zêdetir nîn bin, tevî dema ku vekolin li serê hatibe kirin, tenê 2 sal dê rakeve. Dema bin çav mayîne de ji bo sîcên yekane 24 saet, sîcên girseyî 4 roj, dadger dikare vê demê 2 qat bike, yanê bike 8 roj. Ji bo sîcên ku dikevin nav sî-

norên Dadgehên Ewlekarî yê Dewletê, ji sîcên yekane re 48, girseyî jî 15 roj, li "Herêma Rêveberîya Taybêff" ev demê 2 qat be. Bi îşkence îfadestendin û îşkencekirinê qedexa dike, dellên ku bi riya îşkenceyê hatibe bidestxistin nayên qebûlkirin... Ev guherînê nû tiştêkî nû ji girfî û dilên Kurdan re nayne. Bi gotîneke din, Dadgehên Ewlekarî yê Dewletê (DGM) piştî vî qanûnî dê bi tenê li dawê û dozên Kurdan binihêre.

Hêza çakûç û tirsê Tirkiyê

Navenda Nûçeyan- Dema ku hêza çakûç li Bakurê Kurdistanê bi cih bûyê wê di dawîya meha 12 an de biqede. Dewletên ku di vê hêzê de cih digirin; Amerîka, Îngiltere û Fransa dixwazîna hê-

demek din jî, li vê herêmê bimînin. Gava pêşî ku ev hêza hevgerî xwest di vê herêmê de be cih bibe; bi armanca piştigiriya Kurdên Başûr û wan jî zilma Sedam biparêzin, hatin wir. Ev ar-

manca xuyayî ye. Lê bi rastî daxwaza wan a ji dil bi temamî bi cihbûna di Rojhilata Navîn de bû. Ev jî parçeyek ji plana "sazûmana dinya nû" bû. Bi vî awayî ev dewletên Împeryalist di Rojhilata Navîn de cihê xwe girtin.


Ev hêzên hevgerî di Bakurê Kurdistanê de bi cih bûne. Di vê mehê de Tirkiyê bi temamî hêzên xwe yê leşkerî êrişî ser Başûrê Kurdistanê kirin, bi armanca tunekirina PKK'ê. Ev rewşa Tirkiyê ku ketin Başûrê Kurdistanê li xweşa dewletên Ereban û Iranê neçû. Dilnexweşiya xwe bi planên Tirkiyê ên di pêşerojê de ku bi temamî hakimiyeta xwe li ser Bakurê Irakê deyne û dernekeve ve girê dan. Wezîrên karên derveyî yê Iranê û Suriyê vê nexweşiya xwe di serdana xwe ya Tirkiyê de anîn zimên.

Ev wezîr vê tewra Tirkiyê ya ku bi rehetî hatin ketin Bakurê I-

raqê bi ewlebûna wanî bi vê hêzê ve girê didin. Û di pêşerojê de naxwazîna ev sînorên mevcût bi tu awayî biguherin.

Lê têkoşîna rizgariya neteweya Kurdistan ku bi pêşengîya PKK, di Rojhilata Navîn de dimeşe dibe tirs û astengî li ber berjewendiyên dewletên Împeryalist û dewletên li herêmê. Ji ber vê yekê jî ev dewlet di çî mijarî de li hev nekin jî gava pirs tê ser mesela Kurdan tev dibin yek deng û naxwazîna têkoşîna bi tu awayî bi pêş keve. Tirsê wan a herî mezin jî ev e.

Îngiltere pêşniyariyek da ku Tirkiyê, Amerîka û Fransa li ser dewama Hêza Çakûç civînek bi dorfirêhî çêkin. Ji şex meha carekê jî bo mayîna vê hêzê biryar ji meclîsa Tirkiyê dertê ku ka li wir bimîne an na. Lê heta niha her car jî bo berdewamiya wê biryar hatine standin. Wê di meha 12 an de, di sa li ser rewşa "Hêza Çakûç" bê sekinandin. Di van rojên pêşî de jî wê Serokwezîrê Komara Tirk Süleyman Demirel here Îngiltere ku li ser rewşê bi dorfirêhî bê sekinandin.



Amerîka, Îngiltere û Fransa dixwazîna ku Hêza Çakûç demake din jî li Bakurê Kurdistanê bimîne.

Bi Kurdekî xwedî firmaya otobusan re hevpeyvîn

'Gelê Tirk jî dixwaze şer bisekine'

Berî demekê leşkerê wê biçûya Sêrtê. Dê, bav û birê wî jî li wir bûn. Diya wî digiriya, leşker pirr melûl û xemgîn bû. Nedixwest ku here li Kurdistanê leşkeriyê bike. Bavê wî moral didayê, dilê wî xweş dikir û wiha digot: "Megrî lawê min, îşev Özal di xeberên televizyonê de digot, belkî heqê Kurdan bide wan û vî şerî bisekinîne." Ev jî dide xuyakirin ku, miletê Tirk jî dixwaze şer bisekine, mirov nemirin.

Navê we bi xêr?

- Navê min Hecî Zekî ye.

Hûn çend salî ne?

- Ez 47 salî me.

We kengê dest bi vî karî kir?

- Min di sala 1967 an de dest bi tûrîzmê kir.

Niha karê we çawa diçe?

- Berê rind bû, niha rêwî nîn in, karê me pirr xirab e. Îro, li welatê me qet kar û îş tune, kes nikare ji cihê xwe bilebite. Pere di berîka xelkê de tune, ji bo kû herin vir de wir de. Hikûmet, ji bo leşkeriyê bi milyara mesref dike, li aliyê din ne febrîqe hene, ne kar. Mirov nikarin zikê xwe têr bikin, wê çawa rêwîti û seychetê bikin.

Hûn leşkeran siwar dîkin, an na?

- Erê, firmayên me giş

leşker siwar dikirin. Niha ji bo leşkeran hikûmetê, genelgeyek derxistiye, bi şev leşker bi aliyê Kurdistanê ve naçin. Her dem bi roj dikevin rê, serê sibê siwar dibin ku dibe êvar, cihê gihiştine lê dimînin dora rojê dîsa siwar dibin. Bi vî awayî rêwîngî dikin. Ev genelge ji bo tendurustiya leşkeran derxistine. Û tîmên taybetî, li otobusên firmayên Kurdan siwar nabin.

Leşkerên ku bi otobusê diçin Kurdistanê û tîm, ji aliyê psîkolojiyê ve rewşa wan çawa ne?

- Psîkolojiya leşkeran her diçe xirab dibe. Carekê min dît ku çend heb leşker bi diya xwe û bavê xwe re ber bi buroya firmayekî ve diçûn û bilêti xwe birrîn, dê û bavê wan ew li otobusê siwar kirin. Lê, dema



Li Kurdistanê êdî leşker li otobusên Kurdan siwar nabin û bi roj demakevin rê.

otobus ji Topkapı derket, ew leşker peya bûn û reviyân.

Dîsa berî demekê leşkerê wê biçûya Sêrtê. Dê, bav û birê wî jî li wir bûn. Diya wî digiriya, leşker pirr melûl û xemgîn bû. Nedixwest ku here li Kurdistanê leşkeriyê bike. Bavê wî moral didayê, dilê wî xweş dikir û wiha digot: "Megrî lawê min, îşev Özal di xeberên televizyonê de digot, belkî heqê Kurdan bide

wan û vî şerî bisekinîne."

Ev jî dide xuyakirin ku, miletê Tirk jî dixwaze şer bisekine, mirov nemirin. Lê belê, hikûmet vî şerî roj bi roj pêştir ve dibe.

Hûn di otobusên xwe de qasetên Kurdî lê dixin?

- Erê, em lê dixin.

Dema hûn qasetên Kurdî datînin ser teybê reaksiyonên (tepkîyên) rêwîyan çawan in?

- Carna rêwîyên Tirk dipirsin û dibêjin: "Ev qaseta

kî ye? Ev kî ye distire? Muzîka wî pirr xweş e, em dixwazin bistînin."

Der heqê rewşa gelê Tirk de hûn çi difikirin?

- Em dixwazin ku îro gelê Tirk jî serê xwe rake û bibêje, em şer naxwazin, bila ev şer biqede, miletê Kurd û Tirk wek bira, jiya na xwe bi hev re, di nav wekhevîyê de serbest û azad bidomînin.

Hevpeyvîn:
Aynur Bozkurt

Nefîkirina Kurdên dora Enebol û Konyayê

Bekir Yıldız

Piştî sed sala 19 an, bi taybetî piştî serîhildana Mîr Bedirxan û dû re jî Yezdan Şêr, hetanî serhildana li Dêrsimê, bi sed hezaran Kurd hatine nefîkirin. Hinek ajotin nav Ereban û hinek jî ajotine Enebolê. Armanca wan a herî mezin ew bû ku; bîr û baweriya Kurd û Kurdistanê, ji holê rakin.

Niha bi sed hezaran Kurd li Enebolê hene. Ev li ser dîroka nefîkirina xwe bê xeber in, an jî, ji awira

înfomasyona (zanîna) dîrokî, ne tîr û tije ne. Sedema herî mezin ew e ku, dagîrkeran tu tişt di vî alî de li ber destan ne hiştine, an jî guherandine.

Di demeke nêzik de bi endamê YRWK, (Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistan) rojnamevan Gabar Çiyan re hevpeyvînek kin hate kirin. Wî da diyarkirin ku, dê di nêzik de pirtûkeke li ser nefîkirina Kurdên Enebolê û bi taybetî jî, li ser Kurdên li dora Konyayê binivîsîne. Li ser vî yekê ez çûm cem

wî û min, karê ku dikir, di cih de dît. Min xwest ku bi vî nivîsa xwe, li ser karê ku ji bo pirtûkê dike, we agahdar bikim.

Pirtûkên ku rast e rast li ser vî karî bi çavên Kurdan hatibe nivîsandin tune ne, an jî ne tîr in. Ji vî awirê, hevalê Gabar, çar alî li vî karî geriya û lêkolînê dike:

Ji awira dîrokzanaya Tirk

Ji awira dîrokzanaya Kurd

Ji awira dîrokzanaya Ewropî

Ji awira dîrokzanaya A-

sûr û Ermenîyan

Gabar çiyan ku nûçevanê rojnameya Welat û berpirsiyarê rojnameya Yekîtiya, li Swêdê, ji bo ku politîka dagîrkerên Kurdistan ji awira nefîkirinê bide xuyakirin, pirtûkê dişuxule. Diyar e ku li ser du bingehan dê sedemên ajotinê bide der:

Sedemên dema Osmanîyan

Sedemên piştî Osmanîyan

Ji bilî vî karî di vî pirtûkê de, wê bi kinahî li ser dîroka Kurdistan. bê seki-

nandin. Herwiha piştî sed sala 19 an û vir ve, yek bi yek dê şameyên eşîretên Kurdan bide nasîn.

Sedema ku li xwe vegeerîna bi eslê jî, beşek ji karê wî ye û wiha diyar e ku dê di vî pirtûkê de, li ser sedemên "li eslê xwe vegeerîne" jî, bête sekinandin. Ev zêdeyî du salan e ku heval Gabar dikole.

Ji gelek awiran ve dê ev pirtûk tiştên nû bi xwe re bîne. Her ne ji bo Kurdên Enebolê, lê ji bo Kurdên din jî, weke kaniyek herdemî. Dê bê bi kar anîn.



Zanista bê xeyal û hunera bê rastî (heqîqet) tune.

Vladimir Nabakov

Ev çûyîn t êkçûyîn e

Çendekî berê pirtûkeke M. Ali Birand bi navê "PKK ve APO" hate weşandin. Di vê pirtûkê de di sala 1988 û 89 an de hin hevpeyvîn û t êkiliyên Telabanî ku bi Birand re kirine ji hatine nivîsandin.

Telabanî, di vê hevpeyvînê de, di gelek cihan de li ser rewşa PKK'ê radiweste û dibêje: "Li ser sozên xwe namînin, peymanên ku hatibûn çêkirin li gora berjewendiyên xwe şirove dikirin û kengê li xweşiya wan nehata li gora serê xwe tevger dikirin. Siyaseteke wan a sererast tune." Gotinek pêşyan hiye dibê ku "Diz xwediyê malê girt." Tu dibêji qey ev gotin bi taybetî li ser vê rewşa Telabanî hatiye gotin, ji ber ku ew çend lê t e.

Demekê digot "biji Sedam" û li sînorê Çolemêrgê wî û PDK'ê di rojekê de 600 pêşmerge ji hev û du dukuştin. Îro her çiqas bawerî bi hev nayin ji, piştî xwe dane hev.

Di dema ew peyman ku dibêje "bi PKK re hatiye çêkirin" de digot "bimre TC a faşîst." Îro dibêje "Ez Kurdê Tirk bûma (ka tê çî maneyê ez nizanim) li hember TC a demokratîk min ranedihîşt çek û şer nedikir." Bi van mijûlayîyan ji nema, bi pasaporta sor a TC'ê çû li deverê gerdûnê (dinyayê) gešta xwe kir.

Demekê jî digot "Ez, sosyalist im." Îro milê xwe ji milê dewletên împeryalist û dagirkeran dernaxe û dibêje: "Di xortaniya xwe de min jî hin heyalperestiyên dikir."

Pêwîst nîn e ku mirov li ser van politikayên Telabanî zêde raweste. Ji ber ku êdî siltanê kerr jî bi van politikayê Telabanî yê mîna nanê sêlê hisiyaye. Em, tenê dibêjin ku, divê mirov pêşî derziyê di xwe rake hê şûjinê di hevalê xwe rake.

Di cihek de wiha dibêje: "PKK, dema ku em bi hikûmeta Iraqê re ji bo sitendina hin mafan di t êkiliyê de bûn, ew jî çûn bi Partiya Kominîst a Iraqê re ketin t êkiliyê û gelek rexne yê tûj li me kirin."

Niha hem di vê nivîsê de û bi taybetî jî di rewşa îro de ku Telabanî û Berzanî t e de ne, tiştê ku PKK'ê wê demê digot îro eşkere bûye û ev t êkiliyên ku bi kedxwara re bi dizî dihatin danîn îro li ber çavên temamê gerdûnê (dinya yê), bi temamê bêrûmetiya xwe t ên danîn. Ev jî rastiya rexne û ramanên PKK'ê nîşan dide. Ha em b ên ser alîkariya wan a ku bi PKK'ê re kirine: Berî her tiştî gere mirov v e zanibe ku ew jî mîna dewletên împeryalist her tiştî ji bo berjewendiyên xwe yê n şexsî di-

kin. Ev jî rastiyeke e ku PKK, bi rastî û dirustiya xwe ji bo berjewendî yê n neteweyî nêzikayî li wan kir. Lê belê Berzanî û Telabanî, di dîroka wan de ji nîşan dide ku, dema yek ango rêxistinêk wê karibe rûyên wanê qirêj derxe holê ji berjewendî yê n wanê şexsî-êşîrî re bibe talûke, wê demê ku ji destê wan bê, wan rêxistin ango kesan îmhîa dikin. Li yekî mîna seydayê mezin Mele Evdila yê Xerzî (Timoqi) jî îşkence kirin û xwestin wî bikujin. Welatparêzekî mezin Sadîk Ömer jî kuştin. Di dawîya van politikayên wan ên şaş de timî xwîna gelê Kurd dirije.

Di cihek de jî dibêje ku "PKK bi qasî ku t e zanîn ne bi hêz e lê belê di nav rêxistinên Kurd de yê n



herî populer ew e. Di nav Kurdên Ewropa yê n aktîf de Apo gelek populer e. Di nav gelê Kurdistanê başûr, Başûrê Rojhilat û Kurdên Lubnanê de jî hezkirin û populartîta PKK û Apo gelek mezin e. Dema mirov diçe malê wan wêneyên Apo li malên wan daleqandîne." Ê baş e, ev ne hêz be çî ye ji hêzbûnê hûn çî fê m dikin? Hêza herî mezin, ku kare li hember temamî hêzên gerdûnê raweste, hêz û alîkariya gel e. Lê: ji ber ku ewan tu car û tu car bawerî bi gel nehanîne, hêza gel çî ye nizanin.

Li ser Kurdistanê serbixwe, yekbûyî û demokratîk jî dibêje: "Ez di xeyalan de najîm. Ez ne bawer im ku ezê Kurdistanêke wiha bibînim. Li Tirkîyê jî hin kes dibêjin ku em Tirkên derve bigihînin hev. Lê belê heta îro jî nîkariyên tiştêk bikin." Ev raman jî dîsa ji bêbawerîya hêza gel t e. Wekî din jî, bi kîjan mantiqî daxwaziya yekbûyîna Tirkan û ya Kurdan mîna ya Tirkan dibîne? Daxwaziya Kurdan mîna ya Tirkan daxwaziyeke nijadperest nîn e û em ne bi daxwaziya xwe ji

hevûdu bûne, bi darê zorê em jî hevûdu parçe kirine. Bila Telabanî vî jî baş zanibe ku alternatîfa parçebûna bi darê zorê, serxwebûn, azadî û yekbûyîne jî dîsa darê zorê ye. Ji ber ku tu dewletên dagirker-kedxwar, bi riyên demokratîk yek mûyek jî nade gelê bîndest. Esas xeyalperest ev e. Telabanî her çiqas dibêje ku ez bi xeyala najîm jî, em zanin ku ew di xewa heftan de ye.

Dewletên împeryalist jî n e ji bo çavên wan ên reş û belek ji wan re alîkarî dikin. Tîrsa wan a herî mezin ev e ku, dibêjin "wê PKK Kurdistanêke serbixwe û sosyalîst ava bike û ev şoreş wê t e-sîra xwe li ser temamê gelê Rojhilata Navîn yê n bîndest bike, wê jî wan re bibe mînak. Ev jî destpêka tunebûna me ye." Ji ber vê yekê alîkariya kesên mîna Telabanî û Berzanî, ku ji bo berjewendiyên xwe yê n malbatî her tiştî karin bifiroşin dikin.

Hê di sala 1989 an de Telabanî jî M. Ali Birand re dibêje: "Bibe navbeynkarê nava me û Özal û jê re bibêje ku temînata me ya herî mezin Tirkîye ye. Ger Tirkîye, ji me re bibe alîkar emê jê re deriyê Bakurê Iraqê (Başûrê Kurdistanê) vekin û emê Tirkîyê bibin heya nava Kerkûkê. Petrola Kerkûkê gelek dewlemend e. Hem bi vî a-wayî wê xweyî li Tirkmenên Kerkûkê û li me jî bike. An na wê PKK roj bi roj bi hêz bibe. Emê jî bikevin berdestê Amerîka, Îngilîz û Fransîzan". Ev jî nîşan dide ku bûyerên ku berî mehek û niv dest pê kir, hê jî wê demê ve dihat plankirin.

Kesên bawerî bi xwe, bi gelê xwe neyne, timî bixwaze di bin himayekirina hin hêz û kesên din de be, ew mirov xwediyê riheki koleye û her wekî serokê PKK ê Abdullah Öcalan dibêje: "Kesên ku kole bin û xwedî rihek kole bin, tu kes jî wan hez nake, ji ber ku bê rûmet in û tu kesayetî bi wan re tune ye."

Di dema borî de gelên Kurdistanê başûr xwe bi Telabanî û Berzanî ve girê didan. Lê wê demê di maneyekî de jî mecbûrî xwe bi wan ve girê didan. Ji ber ku wekî din alternatîfêke wan tune bû. Lê belê îro gelê Kurdistanê başûr êdî dibîne ku alternatîfêke wana rast weke PKKê heye. Ji ber vê yekê roj bi roj ber bi PKK'ê ve diçin. Tîrsa Telabanî û Berzanî ya herî mezin jî ev e. Ji ber vê yekê kê bêhtir ber bi împeryalist û dagirkeran ve diçin. Lê em bawer in ku, ev çûyîna wan t êkçûyîna wan e. Ji ber ku tu hêz, bê piştgirî û bawerîya gelê xwe li piya namîne.

Salar Amedî

TÎR

Musa Anter



Xal Musa, to ganî remayîşê dizdan bidînî

(ZAZAKÎ - 2)

M i nê maqalan di kapasîta Xal Musay hina weş fem kerdi. Mi nê fikrê xwi gelek cayan di vato, ez tiya di rayna vano: Herçî ma miyan di no ware di, yewna mêrdimo ehendey wayirê qabiliyetî çinî yo. Helbet gelek kes şeno maqale binuso û nuseni zî. Labelê nuştîş ra nuştîş ferq esto. Xal Musay heme qategorî û tebeqandê civatî rî nuştîni. Herkesî yo fem kerdinî. Ziwanê cê sivik, mesajê cê eşkerîa bî. Wendoxê Xal Musay hem dewicê Botanî, hem roşanbîrê Estembuli û hem zî dikandarê Diyarbekir bî. Hemînî zî Xal Musay ra kes kerdinî. Herkesî gore bê xwi nuştandê cê ra fayde dîni. Maqalandê cê ra asaynî ki, Xal Musay yew mêrdimdo gelek bi kultur o. Ez rastê yewna nuşttoxê anasarênî nêamewo ki, bişo nuştanê xwi bi ehendey meselan û fiqran bixemelno. Hema hema her maqalada cê di yew meselaya ki şarî miyan di vacaynî bî. No xususiyet roşanbîrandê ma Kurdanî di kem o.

Maqalandê cê ra asaynî ki, Xal Musa yew mêrdimdo gelek bi kultur o. Ez rastê yewna nuşttoxê anasarênî nêamewo ki, bişo nuştanê xwi bi ehendey meselan û fiqran bixemelno. Hema hema her maqalada cê di yew meselaya ki şarî miyan di vacaynî bî. No xususiyet roşanbîrandê ma Kurdanî di kem o.

Kê yew yew nuştî cê wendinê kê vatîni qey, yew filozofî nuştî. Tayn maqaley cê to vatîni veynî yew profesore tarixî nuştî. Ge ge ti ewniyaynî çeryananê edebiyatî munaqêşe keno. Yew teologî ra vêşer dîn ser o zanaye bi. Semedo ki yew mêrdimdo cerebnaye bi û hînzaran reydi giryew ameybî yê serî sar di, şiyaynî hedîsanê cematîki yew hewardo rast analîz biko. Cora zî wendoxê Xal Musay hemînî ra vêşer bî.

Xal Musay, 1930 ra bigêrî hetan nika, behsê heme girweyê muhîmê ki ameyî Kurdan serî sar di, kilm ya zî derg, kerdo. Nînan re teber zî Xal Musa, bi t êkiliyanê xwinê gelek erjiyayan, zaf mêrdimê muhîm û beylukerdeyî şinasnaye. Qorê yê bi xwi diyî, qorê zî yê bi xwi nêdiyî, labelê fekdê diyin ya hîrin ra derheqê yîni di biyo wayirê yew fikirî. Ebi inhewa gelek meseleyê ki nê se-dîsey serranê peyanan di qewmiyayî nuştî. Aw semed ra Xal Musa liylikê nê se-dîsey serranê peyanan bi. Bêguman kê şênî vacî, yo ansîklopediyê Kurdan bi. Yê zanayîş û qabiliyetê xwi hezey zafîney unverandê xwi reyra nêberd mezel. No xususiyetê Xal Musay ganî kê xwi virî nêki.

Xal Musa, mêrdimê çaxê xwi bi. Xal Musa şima çendeyî vacî ehendeyî Kurd bi. Gelek embazê cê, Kurdeyda xwi ra şermayayî û heze yew Tirkî merdî. La yê? Rojo ki xwi zanawo hetanî rojê şehîdbiyayîşê xwi, ver a dewleta Tirk lej kerdo. Hezey yew roşanbîro welatperwer tim û tim ver a dewletî çarey yê tokerde bi. Zulum û zordarey caran nişaya zorê yê bera.

Xal Musa, roşanbîrê şardê xwi bi. Hetanî peyniydey emirdê xwi Kurdistanî ra durî nêkewt. Wexto ki Suadiye di bi zî, hêşê yê Sitilîlî, Dêrsim û Wanî ser o bi. Zerrey Xal Musay tenik bî, nişaynî barî û ciziyey gedanê Nuseybîni nêşnawo. Ney, yo ehendey zalim û bêbav nêbi. Bi a erdişî xwina sipî, dest eyşt qelemdey xwi û vazda hewardey eylekan. Herçî çî yê ra ame textsîr nêkerd.

J. Espar
Domahik esto

Bi mebesta tesbîtkirina delegeyên Meclîsa Neteweyî, gelê Kurd hibijartinê çêdike

Ji bo meclîsê gava yekemîn

Nayenda Nûçeyan- Kampanya hibijartinên Meclîsa Neteweyî bi awayekî fermî, beriya du hefteyan dest pê kiribû. Dê ew kampanya heta 19/11/1992 an dom bike. Berendamên Meclîsê, ji bo ku bikaribin hibijêrin xwe qane bikin û ev dema xwe bi kêrtir bi kar binin, bi awayekî dijwar rêdikoşin. Ji bo vê yekê pergalekî cur be cur bi kar tinin. Bê guman kampanya hibijartinên Meclîsa Neteweyî, bi gelek aliyên ve jî nasibe hibijartinên normal. Û ji tu aliyekê ve nasibe hibijartinên Tirkan.

Beriya her tiştî em bêjin, pirraniya berendamên kampanyayên xwe bi hev re dimeşin. Bi hev re civînan amade dikin û bi hev digerin. Dîsan pirrê caran bi hev re derdikevin hemberê hibijêrên xwe, dîtî û baweriyên xwe li ser pirs û pirsgerêkên şoreşê û Meclîsê dibêjin. Berendam xwe bi hibijêrên xwe re didin nasîn. Xelk tî civînan û munaqeshe dikin. Mijarên bingeşîn ku tî munaqeshekirin erk û wezîfeyên Meclîsa Neteweyî ne. Li ser berpirsiyarî û maf-

dariya hemwelatîtiyê jî gotûbêj tîne kirin. Ez bawer im ku bi vê hibijartinê dê şûra hemwelatîtiyê hin jî pêş keve û bibe xwediyê naverokê dewlemend. Ji ber ku muxatabê Meclîsê hemû hemwelatîyên Kurdistanê ne. Kurdistan û rûniştvanên xwe, dê piştî vê hibijartinê hevûdu baştir nas bikin û bêhtir nêzikî hev bibin.

Heta niha bi tenê li Swêdê, li bajarên Stokholmê, Uppsalayê, Orebroyê, Goteborgê, Eskilstunayê, Bollnasê û li Fittjayê 6 civînan mezin hatine amadekirin. Li Norwecê, li bajarên Oslo û Stavengerê; li Danîmarkayê li bajarên Kopenhagenê, Julandê û li Helsinkiyê civînan mezin hatine amadekirin. Li gor agahdariyên ku me girtiye wê li gelek derên din jî, civînan wiha bî amadekirin. Ji xeynî wan gelek civînan lokalî jî hatine lidarxistin. Li gor ku serekê Komîsyona Hilbijartinê dibêje, heta niha bes li Îskandinavyayê bi hezaran kesên hibijêr beşdariya van civînan bûye û der barê hibijartinan de bûye xwediyê

agahdariyan.

Di hin deran de berendam qasetên videoyê amade kirine û wekî pergalekî propagandayê bi kar tinin. Berendam ji radyoyên lokalî îstifade dikin. Mesela li Stokholmê radyoya Dengê Serxwebûnê, ji bilê programa nûçeyan hemû dema xwe daye xizmeta hibijartinan. Berendam mal bi mal digerin û propaganda hibijartinan dikin. Ji bo hibijartinan afîş hatine çêkirin û gelek der bi van afîşan hatine xemilandin. Bi sûretên berendam, afîşên mûsterek ji bo berendam hatine amadekirin. Dîsa kurtejiyana berendam li gel sûretên wan wekî broşur hatine çapkirin. Ji bo nasandina berendam belavok hatine amadekirin û hwd. Pirraniya van karên jorîn berendam bi hev re kirine.

Helbet gelek berendam bi serê xwe jî kar dikin û li lokalên komeleyên Kurdan digerin. Qasetên propagandayê belav dikin û bi hibijêrên xwe re qise dikin û hewl didin.

Wekî gelekî deran, li hemû welatên Îskandinavyayê jî, ev

kampanyaya geş û gurr tesîr li hemwelatîyên Kurdistanê dike û wan ji bo kar û barên Meclîsê mobilize delivîne dike. Li Swêdê, Danîmarkayê, Norwecê û Finlandiyayê, hemwelatîyên Kurdistanê bi awayekî aktîf proseş (domana) hibijartinên Meclîsa Neteweyî dijin.

BERENDAM GELEK ÎN

Ji bo berendametî dema serlêdanê heta 8/11/1992 bû. Li gor agahdariyên ku me ji Komîsyona Meclîsa Neteweyî ya Ewrûpayê stendiye, li welatên Îskandinavyayê gelek hemwelatîyên Kurdistanê serî lê daye ku bibin berendam. Li Swêdê, ji bo 5 nûneran 21 kes serî lêdaye û berendamtiya 20 kesî hatiye pejirandin. Li Danîmarkê, ji bo 3 nûneran 7 kes serî lê daye û hemû wekî berendam hatine pejirandin. Li Norwecê, ji bo 2 nûneran 6 kes serî lêdaye û hemû wekî berendam hatine pejirandin. Li Finlandiyayê jî, ji bo nûnerêkî 4 kes serî lêdaye û hemû wekî berendam hatine pejirandin.

Di hefteyekê de du rojnamevan kuştin

NÛÇEVANÊ HHA KUŞTÎN

Rojnamevanê "Hürriyet" ê Hatip Kapçak, bi êrişa kontrayan hate kuştin. "Hürriyet" li nûçevanê xwe xwedî derneket, Hatip Kapçak, li Şemrexê (Mazıdağ) ya Mêrdînê, li ber derê dîkana xwe, ji alî 3 kontrayan ve hate kuştin. Êrişkar piştî cînyatê reviyên. Piştî bûyerê 3 kes hatin girtin. Cendekê Hatip Kapçak, roja 18'ê Mijdar 1992 an bi beşdariya 3 hezar kesî, li nav tîrbên şehîdan hate veşartin.

Ji bo protestokirina vê cînyatê, esnaf dikanên xwe venekirin, xwendekar neçûn dibistanan û şofêr erebeyên xwe nexebitandin. Karker û karmendên Belediyê, postexanê û saziyên fermî neçûn ser karên xwe. Cemiyeta Rojnamevanên hêrêmê jî, ev bûyer protesto kirin.

NÛÇEVANÊ

'GERÇEK'Ê KUŞTÎN

Nûçevanê kovara 'Gerçek'ê yê Diyarbekirê Namîk Tarancı, roja 20 Mijdar 1992 an, ji alî kontrayan ve hate kuştin. Namîk Tarancı, roja îne, li ser rîya karê xwe, ji alî 3 kesên ve, bi gulebaranê hate kuştin.

Weke tê zanîn, demek berê, di kovara 'Gerçek'ê de, bi berpirsiyarekî hizbî kontrayan re, roportajek hatibû weşandin û di vê roportajê de, tîkiliyên polis û kontrayan bi awayekî eşkere berbiçav bûbû.

Li gor daxuyaniya kovara 'Gerçek'ê, piştî vê roportajê, gelek tehdît biribûn ser buroya wan a Diyarbekir. Beriyan Namîk Tarancı bî kuştin bi rojekî, mirovekê tê buroya 'Gerçek'ê û wan tehdît dike. Dû re xebatkarên kovarê li dû vî mirovî derdikevin û wî taqîb dikin. Dibînin ku ev mirov raste rast diçe, Miduriya Emniyeta Diyarbekir. Kovara 'Gerçek' dibêje: "Em qatîlan nas dikin, qatîl hêzên dewletê bixwe ne." Jixwe, êdî ew jî cînyatên xwe venaşerin.

Zû an dereng mafdarî wê bi ser bikeve

Ji destpêka dîroka mirovan ta îro, mirovahî bi giştî bi pêş ve çûye. Sîstem û nîrxên kevin dema ku pêvajoya xwe temam kirine, şûna xwe dane yên ji xwe pêşverûtir û hemdemtir. Mafdarî di tîkoşîna li hember bêdaletiyê de bi giştî, zû an dereng bi ser ketiye û dikeve.

Ev tîkoşîn hê jî dom dike û ta ku çînen civakî hebin wê ev tîkoşîn jî bidome.

Bes, dîrok an jî pêvajoya dîrokê û tevgera ku mirovahiyê bi pêş ve dibê herdem di xeteke rast û ritmeke sabît de nameşe; carna rastî hin fetil û vîrajî tî, disekine, ji bo demekê gavek bi paş ve davêje an jî pirr hêdî dimeşe. Lê ev nayê wê maneyê ku mirovahî dev ji tîkoşînê berdide û ber bi paş ve dimeşe. Carna jî ber hin sebebên zarûrî, carna jî, ji bo xwebihêztirîkirinê, gav bi paş ve tî avêtin, lê piştî demeke din bi metodên tekûztir, xurtir û berfirehtir ev mirovahî dîsa ber bi pêş ve dikeve rê û wek hespekî rewan çar teleb dibeze.

De hemû tevgerên serxwebûn û azadiya gelan de ev fetil û vîraj an jî kend û kosp hene. Hemû gelên serbixwe û azad di vî pêvajoyê re der-

bas dibin.

Lazim e, rewşa dinyayê ya îro û tevgerên ku tîdikoşîn, bîyî ku ev fetil û vîrajî li ber çav bî girtin, neyên nîrxandin. Pêwîst e tîkoşîna ku îro gelê Kurd bi pêşengiya PKK'ê dimeşîne, dîsa bi vî awayî bî dîtî.

Ev demeke bi qasî du mehan e ku dewletên împeryalist, kedxwar û bi taybetî jî dewleta Tirk û xayînen Kurd ên feodal û reformîst, hemûyan hêzên xwe kirin yek û li Başûrê Kurdistanê êrişên hovane dibin ser tîkoşîna neteweyî ya gelê Kurd. Van hêzên paşverû û dagirker jî aliyêkî ve çiya, daristan û gundên Kurdistanê bombebaran dikirin (hê jî dikin), ji aliyekî ve jî dixwestin gerîlayên serxwebûnê bikujin an jî hêşîr bigirin. Di demajoya van du mehan de, gerîlayan, wek taktîk, hin kampên xwe guhertin, li ber xwe dan û ji bo ev hêzên dagirker bi ser nekevin bi Cepha Kurdistanî re li ser hin probleman li hev hatin û şer sekinandin. Ev lihevhatin di rojnameyên Tirk de wek tîkçûn û xwesi-partîna PKK'ê nivîsandin û dan zanîn.

Lê, piştî demeke kurt, dijminên PKK'ê bi xwe îtiraf kirin ku PKK bi

hemû hêza xwe li ser piya ye û tîdikoşe. Li aliyê din, livbaziyan PKK'ê li Bakur û li deverên din jî qet nesekinîn û her dom dikirin û niha hîn bi hêztir dom dikin.

Tîkoşîna gelê Kurd ne tenê di warê çekdarî, di yên siyasî û çandî de jî didome û bilind dibe.

Roja 21.22'yê Mijdarê II gelek welatên Ewrûpî, ERNK, ji bo tesbîtkirina berendamên Meclîsa Neteweyî hibijartinê delegeyan li dar dixê.

Piştî hibijartinê delegeyan, 6-7'ê meha Kanûnê wê berendam bî hibijartin. Ev jî wê ji bo damezrandina Meclîsa Neteweyî bibe gavekî pirr girîng.

Wisa xuya dike ku tîkoşîna çekdarî wê hêdî hêdî meyweyên xwe yên çêbûyî û gihîştî bide.

Meclîsa Neteweyî jî, pêwîst e wek meyweyên vî şerê çekdarî bî nîrxandin.

Ev Meclîs, bi temamî bi hêza gelê Kurd wê ava bibe, ji ber vî yekê em bawer in ku di rîya Kurdistanê yekgirtî û serbixwe de ewê peywireke girîng û rojke pirr mezin hilgire ser milên xwe û di qada navneteweyî de bibe nav û dengê tîkoşîna serxwebûn û azadiyê.

Mebûsên HEP'ê ji bo demokrasiyê birçî ne!

Greva mebûsên HEP'ê ya birçîbûnê 8 roja dom kir û geleki bala raya giştî kişand. Piştî 8 rojan re di 19'ê Mijdarê de grev xelas bû. Serokê HEP'ê Ahmet Türk û mebûsên Mêrdînê Ali Yiğit armanca grevê şîrove kirin.

Li ser navê 18 mebûsên PKG'ê Ahmet Türk û Ali Yiğit sedemê rojîya birçîbûna xwe anîn ziman. Dema greva birçîbûnê dom dikir, muhabîrê me Şaristan Arjen bi serokê HEP'ê Ahmet Türk re hevpeyvîn kir:

Birêz Ahmet Türk, sedemê ku hûn ketin rojîya birçîbûnê ji kerema xwe re hûn dikarin bînin ziman?

– Rojîya me ya birçîbûnê ne bi şerî û şîrût e. Sedema livbaziya me, ji bo em dengê xwe, armanca xwe, dîtî û ramanên xwe, hin bi gelê Kurd, hin bi gelê Tirk û neteweyên yekbûyî tevî re bidin xuyakirin û dengê xwe belav bikin, vê zilm û zora li ser serê gelê Kurd bidin nasîn.

Îro di vê holê de, zilmeke giran heye. Ev zilm bi dijwarî li ser tevaya gel tîye meşandin. Cinayetên hêzên tarî, şewitandina gundan, koçkirina gundiyan, li herêmê mirovên wînda, di girtîgehan de zilm û zor, politikayên dijî mirovahiyê ra-hîştîye serê xwe û dimeşe. Se-

dema rojîya me ya birçîbûnê ev e ku em bi vê livbaziya xwe van konevaniyên dewletê protesto bikin û hemû hêzên demokrat dawetî çareserkirina van pirs-girêkan bikin.

Serokwezîrê hikûmeta Tirkiyê Demirel der heqê rojîya birçîbûna we de zehf tûj axivî û wiha got: “Eva heye çend roj nêzî 30, 40 polis û leşkerên me li rojhilata başûr şehîd ketin. Heke mebûsên PKG'ê ji bo van şehîdan ketibin rojîya birçîbûnê ez wana teqdir dikim, heke dibine piştî ji PKK'ê re emê li ser vê livbaziya wan kûr kûr biponijîn û der heqê wan de dozê vekin, hûn li ser vê yekê çi dibêjin?

–Demirel nema zane çî bibêje, carekê Demirel ne di destê xwe de ye, bi texmîna min me armanca partiya xwe bi tevê gel daye zanîn. Ez cardin jî dibêjim: Aştî daxwaza me ye, demokrasî daxwaza me ye, tifaqî, wekhevî û biratî bir û bawerîya me ye, em naxwazin ne xwîna leşkerekî an polisekî, ne



Mebûsên HEP'ê 19'ê Mijdarê greva birçîbûnê xelaskirin.

ji xwîna gundiyeke an jî gerîlayekî were rijandin. Em ne dixwazin dayika Tirk bike hewar ne jî dayika Kurd axîn û keser-an bikişîne.

Em dibêjin bila ev xwîn bisekine, bila ev cinayet bisekinin, bila gelê Tirk û Kurd bi azadî bijîn, bila heq û hiqûqên însan nekeve bin piyan, daxwaz û armanca me ev e.

Ali Yiğit mebûsê Mêrdînê ji bi kurtasî li ser rojîya birçîbûnê nêrinê xwe bi vî rengî anî ziman:

Belê ez dixwazim ku bi dorfirehî dîtî û ramanê xwe bînim ziman. Dema di hilbijartinê de ku me di nava gel de geşt çêdikir, soz û peymanên me da gelê xwe, ahd me da, ji gelê xwe re me ev got: Îro hûn

me rê dikin parlamentoyê ji bo ku di riyên demokratîk de em doza heq û mafên we bikin, li hemberî zilm û zora li ser serê we em bibin pêl. Belê ez rastî bibêjim! Li gora xwestin û armanca gel me xwe amade nekir, xeletî û kêmasiyên me çêbûn. Dema ku em li nik gelê xwe cih negirin, kul û birinên gelê xwe li hevûdin par nekin, şahiya ku hebe em li hevûdî par nekin, çî sifeta mebûstiya me heye. Ku zilm û zor li ser gelê min hebe, gelê min di binê zindan û çavan de be, qîre qîra zarokên Kurda ji destê kedxwaran were, qey dibe ku em li meclisê lîngan bavêjin ser hev û li kêfa xwe bimeyzenin.

Hevpeyvîn: Ş. Arjen

Li Avustralya dibistana Kurdî

Li Avustralya, ji bo zarokên Kurdan dibistanek bi zimanê Kurdî vebû. Li ser vê yekê daxuyaniya ku ji alî “Komeleya Kurdên Avustralya” ji me re hatiye birêkirin, li jêr e. “Apo û şoreş û Mizgîn û Bêrivan lawik û keçikên Kurdên li Avustralya hatine dinê û mezin bûne, lê belê bi Kurdî baş nizanin. Hin keç û xortên din jî xwe bi Kurmancî yekcar nizanin. Lê herwiha şiyar in û xurt in û bi zilm û zordarî û weşetiya li Kurdistanê tê domandin baş dizanin û li ser diponijîn. Ji ber vê yekê û ji bo parastin û pêşvebirina ziman û çanda Kurdî bi alikariya Komela Kurdên Avustralya di meha Tirmehê de li bajarê Sydney, dibistana Kurdî hat damezirandin û bi dest perwerdekirina keçik û lawikan kir. Niha 48 xwendekarên dibistanê hene û ev hejmar roj bi roj zêde dibe.”

'Harekata hundirîn'

Serokê Artêşa Tirk Doğan Güreş, sinyala “herekata hundirîn” da. Doğan Güreş piştî herekata Tirk a Başûrê Kurdistanê qala “herekata hundirîn” kir û ji bo destpêkirina herekatê amadebûna xwe anîn ziman: “Dê li hundir jî operasyonên mezin çêbibin, dê koka wan bê qelandin” got. Heta sinorê operasyonê tenê bi “Herêma Rêveberiya Taybetî” nêhişt û ji bo giştî diyar kir. Her çiqas Doğan Güreş niha behsa operasyona “herekata hundirîn” dike jî, bi bûyera Şirnexê dest pê kiribû û li Cizîrê, Çalê (Çukruca), Mêrdînikê (Göle), Pasûrê (Qulp) Pîranê (Dicle), Stewrê (Savur), Kerboranê (Dargeçit) û li çend cihên din belav bûbû.

PKK leşkeran azad dike

Sê leşkerên Tirk ên ku di destê PKK'ê de ne bi rastlêhatina salvegera damezirandina Partiya Karkerên Kurdistan (PKK) tîst serbestkirin.

Li gorî Ajansa Kurd-Ha'yê PKK'ê sê leşkerên ku di şer de ji hêla milîtanên ARGK'ê va dîl hatibûn girtin dê azad bibe. Ev azadkirin jî, ji ber salvegera damezirandina PKK'ê ye Weke tê zanîn Partiya Karkerên Kurdistan (PKK), di sala 1978 an 27'ê meha Mijdarê, li gundê Fisê ku gîredayî navçeya Licê ya Amedê ye di bin Serokatiya Abdullah Öcalan de hatibû damezirandin.

Li aliyê din, salvegera damezirandina PKK'ê de li Ewropa bi şadûmanîyan bê pîrozkirin.

Rastiya şerê başûr û operasyonan

Navenda Nûçeyan– Hêberî deh rojan, rojname û televizyonên Tirkiyê, ji devê serokê Artêşa Tirk Doğan Güreş û Serokwezîrê Tirkiyê Süleyman Demirel, der heqê operasyonên Başûrê Kurdistanê de wiha digotin: “Di operasyonan de zêdeyî 2000 gerîla hatin kuştin, pêşmergeyan jî ew çend gerîlayên PKK'ê kuştine. Yanê, di vî şerî de PKK'ê 4500 gerîlayên xwe wînda kirin, gerîlayên ku mane ew jî, vir de wir de reviyane û giş ji hev belav bûne.”

Piştî deh rojên din, roja 18'ê Mijdarê Serokê Artêşa Tirk Doğan Güreş, ev daxuyani kir: “Di operasyonan de 556 gerîla jî aliyê hêzên me yê piyade, 500 gerîla jî bi bombeyên balefirên me hatin kuştin. 460 heb jî sax hatine girtin. Di vî şerî de 23 leşkerên me

şehîd ketin, 97 leşkerên me jî birîdar bûn. Ji pêşmergeyan 800 heb hatin kuştin.”

Dema em van herdu daxuyaniyan bi hevûdin re muqayese dikin, tê dîtî ku, Doğan Güreş hejmara gerîlayên “kuştî” ji 4000'î daxistiye hezarî.

Di daxuyaniya xwe ya dawî de îtiraf dike ku 800 pêşmerge hatine kuştin.

Ev herdu daxuyaniyên mînak yê li jor, didin xuyakirin ku berpîrsiyarên dewleta Tirk li gor daxwaza xwe nûçeyên ne-rast didin çapemenî û televizyonên xwe. Ew jî, berdevkiya wan dikin û hin derewên din jî li gor berjewendiyên dewletê bi nûçeyên sîparîş ve datînin û bi wî awayî pêşkêşî raya giştî dikin.

Gelo راستiya van operasyonan û şerê Başûrê Kurdistanê çî ye. Ev pêvajoya du mehan e ku rojname û

televizyonên Tirkiyê roj tune ku sed an jî zêdetir gerîlayan nekujîn. Her kumanderakî gerîlayan, nezîkî pênc, şeş caran bi destê van “nûçevanan” hatin “kuştin” Gerîlayên PKK'ê giş em nizanin dîsa çend caran “hatin teslimkirin” û hwd. Ger ev nûçe ji sedî deh jî rast bûna, lazim bû heta niha yek gerîleyekî sax û ne teslimbûyî nemabûya. Lê dawî, wan bi xwe rastî bê hemdê xwe be jî îtiraf kirin.

Hevpeyvîna ku bi Osman Öcalan re di programa “32 Gün” de derket, راستiya şerê Başûrê Kurdistanê baş diyar kir. Ew nûçevan û rojnamevanên ku Osman Öcalan bê hejmar çend caran “kuştin” û hemû gerîlayên wî “teslimê” Berzanî û Telebanî kirin, çûn pê re hevpeyvîn kirin, dîtî û îtiraf kirin ku tiştên heta hingê dinivîsandin, giş de-

rew in.

Ji ber ku ne Osman Öcalan hatibû kuştin ne jî gerîlayên wî dev ji sîlah ber dabûn û ne jî yek ji wan teslim bûbû. Gerîlayên ARGK'ê bi hemû hêza xwe ve, di dest de sîlah û di kampên xwe yê nû de talîma xwe didomandin û ji dîtî û nêrinên xwe yê berê jî tu tişt wînda nekiribûn, hîn bi hêztir û bi bawerîtir bûbûn.

Li aliyê din, endamê Komîta Navenda PDK'ê Fadil Mutnî jî, li ser lihevhatina bi PKK'ê re tiştên ku di Televîzyona “Xebate” ê de anîn ziman, Gotinên O. Öcalan rast derdixîne. Fadil Mutnî wiha dibêje: “Li gor peyman ku me bi PKK'ê re çêkiriye, PKK dikare li Başûr xebatên xwe yê siyasî dewam bike, Televîzyon, rojname û radyoyan ava bike.”

PÊNÛS



Amed Tigrîs

Îhtîras û berjewendiyên şexsî û grûbî

Wek ku xwendevanên me pê dizanin, parlamentoya Başûr di roja 4.10.1992' an de bi îlankirina Dewleta Federal re, bîyara şer li dijî PKK jî girt. Di roja 5.10.1992'an de bi awayekî vekirî û bi koordine, pêşmergeyên Yekîtiya Nîştîman û yên Partiya Demokrat bi jêr ve û ordiya Tirk jî, ji jor ve, êrîşên kampên PKK 'ê kirin. Balefirên Tirk, rojê 25 caran 5.000 ton bombe li ser kampên PKK barandin. Di erdê re jî leşkerên Tirk, ketin nav axa Başûr.

Bi ordiya Tirk re, di eynî bere (cephe) de şer kirin, der û dor li Berzanî û Telabanî teng kir. Di warê siyasî de ew ketin tengasiyê gelek mezin û dijwar. Winda kirin. Li welat û li derê welat, li dijî wan reaksiyoneke mezin pêk hat. Hew dîtin ku êdî demagojî û propagandayên vala nikare wan rûspî bike. Li hinek dek û dolabên nû geriyên û dîtin. Berzanî û Telabanî, di roja 12.10.1992'an de,

Li gor beyan û helwesta we ya jorîn ku hûn dibêjin: "Vê destkeftê bi destefta xwe û dijminên vê destkeftê bi dijminên xwe dizanin. "Tirk dibin dostê we jî na? Çewsandîna (pelçixandin), îhtîras û berjewendiyên (menfeetên) şexsî û grûbî, mirovan dixê vî halê xirab.

yanî 5 roj piştî destpêkirina şer, gazî (bangê) ew grûbên Bakur ku çendekî berê bi wan kongra dabû çêkirin, kir. Hinek ji wan cara pêşin e ku mirov navên wan dibîhise. Hevgirtin-PDK, Yekbûn, Kawa, Vejîn û PRNK. Bi van re gazî PDK Îran û KOMELA jî kirin.

M. Berzanî û Celal Telabanî, ji wan dixwazin ku ew piştigiriya bîyara şer bikin û di wî warî de PKK'ê tewandar (sûcdar) bikin. Li ser navê her yekî kesek diaxive û ew jî gotinên Berzanî û Telabanî dubare dikin. Di dawîya civînê de bîyareke wiha bi wan dide qebûl kirin.

"Civîna hemû partiyên Kurdistanê û ew ên beşdarî vî civînê bûn, tev piştigiriya parlamentoya Kurdistanê û Encûmena Wezîran (bakanlar kurulu) a hêrêma Kurdistanê û bîyara Federalî dikin. Vê destkeftê (qezencê) bi destkefta xwe dizanin û dostên vî destkeftê bi dostên xwe û dijminên vî destkeftê bi dijminên xwe dizanin. Ev serkeftin û hêviya hemû Kurdan dibînin. Her wiha bi vî yekgirtinê û bi vî civîna dîrokî ya nûnerên Kurd di vî beşa azad û demokratîk a Kurdistanê de şad û kêfxweş in û xebat û têkoşîna ji bo serkeftin û pêşveçûna vî yekê dikin.

Hêvîdar in ku PKK, bi vî hişyariyê ve li vî meselê binêre û ji vî zêdetir sedeman ji bo xwinrijîyê ya Kurdan çenekin, bi zanatî xwe ji rîya yekgirtina gelê Kurd cihê nekin.

Serkeftî be Parlamentoya Kurdistanê.

Bi hêzîr, cigirtin û pêşkeftir be hikûmeta Federalî ya herêma Kurdistanê.

Bijî Kurdistan, bijî Kurd
12 10 1992"

(Li Kurdistanê azada civîna hevbeş ya partiyên Kurdistanî, Berbang 84-84.92, Rûpel 10)

Ev dokument belengazî û perîşaniya siyasî ya van grûban baş diyar dikin, ji derî belengaziya siyasî, rûreşî ye. Baş e divê mirov Meclîsê biparêze, lê çima ew li dijî hevkarîya Meclîsê û dewleta Tirk jî tiştekî nabêjin? Çima li dijî dagir û êrîşa Tirkan ranawestin? Wê mahkûm nakin û nabêjin, em hemû li dijî hevkarîya Meclîsê û Tirkîyê bin." Paşê jî mirov dikare li gor bîr û baweriya xwe rexne û lomeyan li Meclîs û PKK bike. Gelo ji bo ku mirov Meclîsê biparêze divê behsa têkiliyên Meclîs û Tirkîyê neke? Dema mirov li dijî van têkiliyan be, welatparêz nayê hesapkirin?

Di roja 12.11.1992'an de jî, Berzanî û Telabanî hatin Silopiyê û bi Serokê Jandarmayê Giştî yê Tirkîyê Eşref Bîtlîs re, civînek li ser encama hevkarîya leşkerî çêkirin. Piştî civînê Telabanî got ku: "Em û Tirk dostên hev ên herî baş in. Ji vir şûn ve bi dostanî û hevkarîyê xurt em dê sînoren xwe biparêzin. Em dê ji bo parastina tixûb, qereqolên musterekek çêbikin."

Li gor beyan û helwesta we ya jorîn ku hûn dibêjin: "Vê destkeftê bi destefta xwe û dijminên vî destkeftê bi dijminên xwe dizanin. "Tirk dibin dostê we jî na? Çewsandîna (pelçixandin), îhtîras û berjewendiyên (menfeetên) şexsî û grûbî, mirovan dixê vî halê xirab.

Bi rastî min bi xwe bawer nedikir ku di demêke wiha kin de refên Kurdan hewqas zelal û diyar bibin. Ev baş e. Êdî her kes baş dizanê kî, kî ye û li ku cihê xwe girtî ye û digirê.

Di gotinên mezinan de bêbawerî

Rasto Zîlanî

Gotinên mezinan, di demên dûr û dirêj de piştî gelek tecrûbeyan tene holê. Rastiya gelperî (giştî) didin nîşan, ji binyata çanda gel tene pejirandin. Bi kurtasî mirov dikare bêje ku ev gotinên han rewşa gel bi jiyânî, aborî, çandî didin ber çavan. Ev gotin bi pirranî herdem rastiye didomînin, lê hinek rastiya xwe winda dikin.

Dema derketina holê ya gotinên mezinan tê rawêj (texmîn) kirin. Hinek henin ji berê ve derketine holê. Wekî "Şer şer e, çî jin e çî mîr e." Hinek henin piştî ola Îslamê derketine. Wekî: "Destê tenê şûrê Elî be deng jê nayê." Hinek jî henin hê nû afirîne. Dema rejîma faşîst 12 Îlonê hate ser text zilm û zordariyêke pîrr mezin li gelî mekir, bê hejmar welatparêz, şoreşvan û mirovên amil, tamil kirin zindanan. Dîlên zindanan roj bi roj zêdetir dihatin pelçiqandin. Gelek seqet man û hatin kuştin. Li ber vî rewşa xerab Şervanê Rizgarî ya Nete-weyî (ŞRN) têkoşin kirin.

Têkoşinê canê gelek lehenga stand. Dirûşma (slogan) têkoşera ku digotin "berxwedan jiyane" paşê bû gotineke mezinan. Çawa tê zanîn sala 1984 an pê ve gotineke din a mezinan tê afirandin: "Serhildan jiyane."


Piştî têkiliyên me bi Tirkan re çêbûn gelek biwêj (deyim) û

tên zanîn. Wekî: "Rom xayîn e" jî zû ve derketiye holê. Lê "birê birê ne tev kurê Mistefê ne" piştî damezirandina Komara Tirkîye afirîye.

"Rom xayîn e", "Roma reş", "Roma bêbext", "malê malyêmeza dibe xurê tarîbîlmeza", "birê birê ne tev kurê Mistefê ne"... çend nimûne ne.

Kurd ji Tirkan re dibêjin "Rom" Dr. Yalçın Küçük di pirtûka xwe ya bi navê "Kürtler Üzerine Tezler" de behsa dewleta Romê dike û dide ronîkirin ka Kurdan ji Tirkan re çima gotine "Rom"

Ji ber hinek xwendevanên me belkî nikaribin li ser "malê malyêmeza dibe xurê tarîbîlmeza" û "birê birê ne tev kurê Mistefê ne" şîrove bikin, dixwazim van gotinan hinekî vekim: Di dawîya Imperatoriya Osmanî de zilm, zordarî, bertîl, dizî pîrr zêde bûye. Ji ber vî qasî kesên reben pîrr hatine



Gotinê pêşiyên rewşa gel a jiyânî, aborî, çandî didin ber çavan.

pelçiqandin. Zalim, zordar û bertîlxurên dizek re Kurdan "Xudanenas" gotine. Bi Tirkî gotine "Tanribilmez". Lê ji ber baş Tirkî nikaribûne bipeyîvin tanribilmez kirine "tarîbilmez". Ev gotin li ser kesên pexil, çavbirçî hatiye gotin. Piştî damezirandina Komara Tirkîye, kî hatibe ser text bi Kurdan re bêbextî û xerabî kirine. Bêbextiya mezin jî ya Mustafa Kemal e. Ji ber vî qasî Kurdan van kesên derketine ser text û ên bi wan av germ dibin re "birê birê ne tev kurê Mistefê ne" gotine.

Em dikarin li ser van gotinan lêkolînên mezin bikin. Lê ne pêwîst e. Gotineke Tirkan heye "Görünen köy kılavuz istemez" (ji gundê xuya re rêber naxwaze). De fermo ên doza biratiyê dikin bila van bêbaweriyên ji holê rakin.

Egîdên Dêrsimê, gulên sor ên Botanê

**ŞİYAR (KAZIM KULLU)
Û 11 HEVALÊN WÎ**

Hûn pasewan (Bekçî) ên, egîdên Mûnzîr
Hûn zarokên serberz (güzide) ên welat
Şiyarê me peyman a me ye
Heya ku em Dêrsimê jî, bikine mîna Botan
Wê tim û tim li milan be
Namlûyên tolehildanan
Em li ber şehadeta wan bi rûmet xwar dibin
Bîranîna wan wê timî di têkoşîna me de bijî.
**Li ser navên êsîrên siyasî yên girfîgeha Nevşehir
Hüseyn Yıldırım**

Koma Amed:

'Em xwe bi formên muzîka Kurdî çeper nakin'

Koma Amed di Cotmeha 1988 an de ji aliyê heşt kesan ve hate damezirandin. Niha kom, ji heft kesan pêk tê. Qaseta ku niha di piyase de ji aliyê "Yeni Dünya Ses ve Plak" ve hatiye belavkirin, di Sibata sala 1990 î de bi dizî hatibû belavkirin. Xebata qasetê jî, li malan domandine.

Di qaseta wan de bilî aletê naskirî, ji aliyê muzîka Kurdî ve, gîtar, bas gîtar, flût ritim saz û hwd. bi kar anîne.

Nêrina we ya li muzîka Kurdî çi ye?

-Bi giştî qaseta me vê pirsê dide diyarkirin. Jixwe armanca me ew e ku, em beşdariyê bidin çanda neteweyî, melodiyên navneteweyî (internasyonalist) têxin nav muzîka xwe û ber bi gerdûniyê ve çûyîn jî, armançê e ji bo me.

A din jî pêvajoyê ku, ji Celal Güzelses ve dest pê dike heye. Ev qonax pîr girîng e. Lewre bi vê demê re gelek klam û stranên me yê gelêrî hatine talan kirin, ji aliyê hêzên mêtîngehkar ve. Em dixwazin ji nû ve wan stranên ku wergerandine zimanê Tirkî û mîna çanda Tirkî tene diyarkirin pêşkêşî gelê xwe bikin. Mîna ku strana ji Soranî wergerandine Tirkî "Ağlama yar ağlama"

Hûn xwe di muzîkê de dixin kîjan kategoriyê û li muzîka gelêrî ya kevneşopî çawa dinêrin?

-Di muzîka Kurdî de, sînorên celebên wê ku ji hev cuda bûne qet kifş nîn e. Em muzîka Kurdî nas nakin. Em dikarin muzîka Kurdî de sê beşan de binirxînin. Stran, klam û pêvajoya ku muzîka Ewropa lê tesîr kiriyê.

Di vê xala sisyan de mirov dikare Şivan û Ciwan Haco bibîne. Lewre hindik be ji Şivan xwestiyê pîrdengiyê bixwe muzîka Kurdî, mînak: strana "Werzê". Lê di van salên dawî de, di xebatên Şivan de bêhna arabeskî pîr zêde bûye. Di Ciwan Haco de jî pîrdengiyê zêde ye bi taybetî di enstrûmantan de.

Di qaseta me ya yekemîn de hindik be ji pîrdengiyê heye. Emê di qaseta xwe ya duyemîn de hîn bêhtir cih bidin pîrdengiyê.

Me di serî de jî got ji ber ku em muzîka Kurdî bi her awayî nizanin em xwe bi rengekî nanavînin, navek li xwe nakin. Bes, bi xwendina parçeyên folklorîk muzîka Kurdî nayê çêkirin. A din jî em naxwazin bi formên muzîka Kurdî xwe çeper bikin. Em dixwazin bi formên muzîkê biyanî jî helbestan bi Kurdî bibêjin. Mînak li Ewropa celeb bi celeb teşeyên (formên) muzîkê hene. Li Ewropa kesên ku bi formên rock muzîkê çêdikin pêşverû û demokrat in. Çima em jî bi van forman bi Kurdî nestirin.

Hûn dibêjin ku em rengê muzîka Kurdî baş nizanin. Rast e baş nayên zanîn, lê bi temamî jî ne wilo ye. Gelek form û ritimên muzîka Kurdî kêm be jî tê zanîn. Ne pêwîst e ku mirov xwe ji vî aliyê ve jî bibêroje (perwerde bike)?

-Rast e, divê kesên ku bi muzîkê meşqul be muzîka xwe nas bike, dengê muzîka xwe tevî form û ritimên wê zanibe û arşiveke muzîka Kurdî çêbike. Helwesta herî rast ev e bi ya me.

Lê em dixwazin nêrineke nû, şiroveyeke nû binin muzîka Kurdî. Ji aliyê teşeyî (formî) ve. Lewre civaka me di lerzînek mezin de derbas dibe. Malzeme jî pîr e. -Em dixwazin vê rewşê bi kar binin. Em naxwazin muzîka ajîtatîf çêbikin û em vê yekê qebûl jî nakin. Mînak Şehrîbana Kurdî, îro qasetên wê hemû wilo ne. Bi hêsani li meyxana lê tê guhdarîkirin.

Komên heja hene. Mîna Koma Çiya, Koma Mezrabotan, Koma Berxwedan. Em wan ji aliyê naverokê ve nêzîkî xwe dibînin, lê ji aliyê formî ve, em ji hev cihê ne.

Armanca me ew e ku, em di muzîkê de ji sînorên neteweyî derkevin. Ji vî alî ve em Ciwan Haco nêzîkî xwe dibînin. Lê ne ji aliyê naverokê ve, ji aliyê şêklê muzîka wî ve jixwe armanca me ne xwegihandina Ciwan Haco ye. Em li Şivan guhdarî dikin û wî mîna hunermendekî klasîk dinirxînin. Mîna Meyrem Xan, Girabet, H. Cîzrawî û hwd. Em beşdariyê Şivan inkar nakin. Ji alî siyasî ve ne hewceyî gotinê ye ku, em wî binirxînin. Lewre êdî her kes

nas dike û dizane ku çi ye.

Bi ya we çima heta niha muzîka Kurdî ya otantik derneketiye holê û nehatiye nirxandin? Çima P. Gabriel û V. Jarayek me nîn e?

-Jixwe ev pîrs bi merc û şertên welatê me ve girêdayî ye. Lê bi tene bi vê yekê jî nayê diyarkirin. Lewre kesên ku niha muzîka Kurdî çêdikin û distirin hemû amator in. Raste rast tu agahdariyê zanistî ya li ser muzîka Kurdî kesên ku bizanibe nîn e.

Ji ber vê yekê ev rewş derneketiye holê. Tesîra Radyoya Erivanê li ser me pîr kesan heye. Bi her awayê xwe ve. Kes naxwaze derkeve dervayî vê rewşê. Bi hemûyan re ev tîrs heye "Gelo ku em şiroveyeke nû binin muzîka Kurdî, dê kes li me guhdarî bike." Li gorî şertên piyase çêdikin. Lewre şiroveyeke nû nayê muzîka me.



Di nav me Kurdan de gelsên bikaranîna zimanê Kurdî heye. Gelek gotinên parçeyan mîna hev in. Yanî êdî ev gotin kevn bûne û zêde jî tûj in. Ji aliyê hunerî ve pîr qels in. Hûn jî vê yekê re çi dibêjin?

-Weke ku hûn jî dibêjin gelemşeyê me ya mezin di vî warî de heye. Em nizanin qenc zimanê xwe bi her awayî bi kar binin. Gotinên helbestan zehf tûj in û gelek jî, ji aliyê mane ve qels û jar in. Divê li pîr kesan tesîr bibe. Divê hem di gotina de û hem jî di muzîkê de hunerî jî hebe.

Ji bo ku qaseta we ya duyemîn xebatên we di çi qonaxê de ne?

-Repertuwarê me amade ye. Lê em dixwazin xwe pîr bigihînin û pişt re dest bi dagirtina qasetê bikin. Heta em dixwazin hemû enstrûmanan em bi xwe lê bixin. Li gorî qaseta me ya yekemîn pîrdengiyê hîn bêhtir li pêş e. Ewê ferqî di navbera her du qasetên me de hebin.

Lê ji ber ku dengê heval Şengal tune ye, emê pîr zorahiyê bibînin. Giraniya şanê yanê hêvotîna (perwerdeya) deng li gorî qaseta me ya yekemîn zêdetir be.



Dîwana hozanvanê azadiyê: 'Evîna Welat'

A. Keskin

Xwendevanên Kurd Abdurrahman Durre baş nas dikin. Ji hejmara yekemîn ve di Welat û Rewşenê de nivîsên wî dertên. Weşanxaneya Melsa helbestên mamoste weşandin. "Dengê Kurdistanê" dîwana yekemîn bi navê "Evîna Welat" derket. Xwendevanên Kurd wê êdî hozanvanekî Kurd, ji nezikî ve nas bikin.

Abdurrahman Durre mirovekî pîralî ye. Di 15 saliya xwe de dest bi xwendinê kiriyê, di gelek medreseyan Kurdistanê de derbas bûye. Demeke dirêj miftîti kiriyê. Bi Kurdî, Tirkî, Erebî û Farsi li dor deh berhemên wî hene.

Hemû meziyetên wî li alîkî, bi baweriya min Mamoste Durre, berî her tiştî hozanvan e. Ew di jiyana xwe de, di raman û tewrên xwe de jî hozanvan e. Di şîra Kurdî ya kevneşop de dengê bilind e, dengê welêt e. Wek Apê Musa jî di "Pêşek"ê de gotî "Ruhên temamê şair û alimên Kurdan di bedena Seyda Durre de kom bûne."

Di serê dîwanê de "kurtedîroka Kurd û Kurdistanê" heye. Di vê beşê de jî bo agahdariyê bi giştî dîroka Kurd û Kurdistanê, dewlet û hikûmetên Kurd (piştî Îslamê), şoreşên Kurdistanê, şairên Kurd û zaravayên wan hatiye nivîsîn. Li dawîya kitêbê jî ferhengok û çavkanîyên kurtedîrokê hene.

KEVNEŞOPA DÎWANÊ

Di nav civakên rojhilat de edebiyat pîr xurt e. Edebîyata devkî di nav gel de gelekî belav bûye. Berhemên wê jî çirok, hikayat û şîr in... Di nav beşan de ya herî xurt şîr e.

Edebîyata kevn a gelên Rojhilat edebîyata dîwanê ye. Kevneşopa dîwanê, di nav Kurd, Ereb, Ecem û Tirkan de xuya dike. Heta dawîya sedsala 19'an ev kevneşop hakim bû. Di destpêka sedsala 20'an de şîr jî guherî. Şêklên nû derketin.

Di vê demê de Kurdistan parçe dibe. Mêtînger çand û zimanê Kurdî qedexê dikin. Dîwan di medreseyan de şin bûbûn. Qedexê û zordariya li Kurdistanê ev kevneşop ranekir. Disa gelek dîwan hatin nivîsîn. Îro ew sînor radibin. Lê mixabin şîra me sedsalî li paşxistin.

Şîrên dîwanê li gorî wezin û şêklê tîrê nivîsîn. Wezin jî edebîyata Erebî derbasî Kurdî bûye. Weznê Arûz pêşî di edebîyata Erebî de hatiye bikaranîn. Di zimanê Erebî de peyv, bi qalib in, li gorî wezin tîrê nivîsîn. Zehmetiyên şîrên ku bi weznê arûzê tîrê nivîsîn zehf in. Hozanvan mecbûr dimîne naverok û peyvên li gora weznê diguhere.

EDEBIYATEKE NÛJEN

Şîra ku bi weznê nû nivîsîn hunerî ye, bi aheng e. Wezn û qafiye şîrê xweş dikin. Lê bi baweriya min bersiva rojê nade.

Di sedsala 20'an de rewşa şîra dinyayê çawa ye û şîra me gihiştîye ku derê? Aragon, Mayakovsky, Boudlaire, Rimbaud, Pound; wezn, qafiye, beyit, misra heta peyv bi xwe belav kirin. Bi tîpan şîr nivîsîn. Em hê jî mirasa Ehmedê Xanî dixwin.

Xelet neyê fêmkirin. Rimbaud, Mayakovsky ne bi serê xwe derketin. Guherîn û pêşveçûnên civakî pêşî tesîra xwe di edebiyatê de didin xuyakirin. Tolstoy, Turgenyev di romanên xwe de guhertinên pêşerojê nişan didin.

Civaka Kurd hêdî hêdî tê ser xwe. Tu kes hêviya edebiyateke nûjen ji welatekî zimanê qedexekirî nake. Îro rewş guheriyê. Bingeha şîreke nûjen di dîwana mamoste Durre de xuya dike.

HÊVIYA PÊŞEROJÊ

Li dinyayê, li tu welatan roman, şîr şêklên nû jî xwe ve derneketine. Li welatê me bingeha çandê nû çêdibe.

Çanda me ya kevn çawa ye, li ser çi bingehî ava bûye? Berî her tiştî divê em wê zanibin. "Evîna Welat" wek pîrekê ye. Ji aliyê naverok û uslûbê ve nûjen e. Mirov wexta helbestên Durre dixwîne ji pêşerojê hêvîdar dibe. Mînakên şîreke nû nişan dide.

Abdurrahman Durre di şîra Kurdî de dengêkî nû ye. Gazî dike, hewar e, qîrîn dike dinale:

Hewar e, xûn ji çavê min dibare, hêsiyê min ka?
Neyar e, dijmin e, heval û hogirê min ka?

Li koma wan der û zoma, ku lê da koçeran goma
Ji min gazî nêkin loma, sitêr û pêwirê min ka?

Hewar e! Şêrê rizgarî jî wî derdê kezexwari
Li zozanê me xûnberî kewa azadî jê fir da

Şîra Durre qalib û şablona dişkîne. Şêklê kevin, naverokeke hemdem û fireh bi Kurdî-yeke geş tîne ba hev û wek straneke pîrdeng bilind dibe:

Tenê me bê kes û dost û heval û hogir û yar im
Tenetî yar e bo min bê kesitî par e seyda kê

Çiya û war û zozanê me lê barit û duman e
Ku hat fêsla zivistanê hewa pir sar e seyda kê

Gotina dawî jî em ji devê Durre dinivîsîn:
Daxwazî dikin ku itîbarê
Hûn bidne wî lê werin hewarê

Lê ku ji kerema xwe kin xelatê
Bûka herema we ku j'we ratê

Xwina dilê xwîn e pel bi pêlî
Anîne me lê ku xeml û xêlî

Belkî ne şepal û narîn e
Lê nav ku 'Evin' e pir şêrîn e.

Meclîsa Neteweyî (Encumena Niştimanî)

Jihevdeketina civaka Kurdan, sedema yekemîn a derengmayîna avabûna encumena netewiya bilind a civaka Kurdan e. Dibêjin, gelekî girîng e ku mirov dîroka xwe baş nas bike. Dema Kurdek bala xwe dide dîroka xwe, ji şerm û fedîyan dixwaze rûyê xwe ji holê veşêre...

Bavê Berzan

Gel û milletên cîhanê, ku di malbata mirovayetiye de, îro her yek ji wan, xwedî cihêkî diyarêde ne, pirraniya wan encumena neteweyên xwe yên bilind, cara pêşîn, bi sedan sal-heta bi hezaran salberî vê demê danîne. Her çend, van encumenên neteweyî yên gelan, di wateya neteweyî ya îroyîn de, ne encumenên neteweyî bûn jî, gelek ji gelên cîhanê, wan encumenên xwe yên seretayî bi hinde guhertinan ber bi vê rojê parastine. Ev civak û gelên hanê, bi bişkivîna berbangaya civaka sermayedariyê (kapitalîzm) jî, di wateya îroyîn de weke gel û millet hatine jimartin.

Meclîseke gelekî derengmayî!

Bê guman, civakên bi çîn,

yên civaka koledariyê, feodalîyê, serdestî û bandûrên xwe li ser civak û gelên biçûk danîne û xwestine wan ji holê rabikin. Dema çînen serdest, di vê mebesta xwe de, yekser û sere rast bi ser neketine, wê gavê jî, di van çalakîyên xwe yên dijberî û şerkariya li ser civak û gelên biçûk de, her dem azîneyeke (metod) îro gelekî naskirî bi kar anîne: Civak û gelên berxwedankar ji hev veristin.

Jihevdeketina civaka Kurdan, sedema yekemîn a derengmayîna avabûna encumena netewiya bilind a civaka Kurdan e. Dibêjin, gelekî girîng e ku mirov dîroka xwe baş nas bike. Dema Kurdek bala xwe dide dîroka xwe, ji şerm û fedîyan dixwaze rûyê xwe ji holê veşêre...

Bê guman em, çi tu car bê

berxwedan jî ranewestine. Berxwedan û bergiriyên (parêzî) mezin, di dîroka me de çêbûne. Lê paşê çi bûye? Ev bûye: Di civaka Kurdan de, bi lîstina dijmin, kêrîbûn (parçe) çêbûye. Anku, hinek ji Kurdan, bi zanetî-nezanetî, xwe firotine dijminên xwe. Di Kurdistanê de, ew bergirî û hilawistinên lehengane, li ber xwefiroşiyê têk çûye. Di dîroka Kurdan de, lîsteya berxwedan û xwefiroşîya dîrokê, gelekî dirêj e. Her du jî, weke du hespên kihêl li ber hev bezîne. Ji ber vê hindê, derfet nîn e ku, em li vê derê, ji her du hêlên dîroka me, wan bûyerên bêserûbin, bi dirêjahî binirxînin.

Lê belê, îro jî em di nava berxwedaneke dijwar de dijîn. Zincîra serhîlanîna dîrokî, bûye xwedî xelekeke berxwedanî ya pirr dijwar. Weke, li dîrokê mişe caran, dubare bûbûn, xwefiroşîya zanetî-nezanetî, xwe li vê berhilawistinê jî qelibandîye. Tiştê ku ji rewşa berê cuda ye, ev e, ku li ber vê bêbextiya dîrokî, ji her caran cudatir, Kurd vê carê hem li serê

dijminan dixê û hem jî li serê bêbextên li nav xwe... Îro Kurd nîn e ku ji vê rewşê ne haydar be. Ji ber vê hindê ye, em dibêjin ne pêwîst e ku em bi dirêjahî çêla (beh-sa) vî tiştî jî bikin. Lê, ji her caran bêhtir pêwsittir e ku em behs û çêla sedema bêbextiya di nava civaka xwe de bikin.

Em xwedî civakeke wilo ne ku dijmin, li ber wan her çar tixûbên xwe yên eşkere, çar hezar tixûbên nediyar di laş û gewdê me de daniye û nîrê xwe yê bindestiyê gelekî jidandîye. Anku mejiyê me li zincîran xistiye. Dema ku em çavê xwe li jiyane vedikin û di nava vê jiyana kole de mezin dibin, ji hişyarbûn û xwenaskirina me re demeke dirêj divê. Ev yek, li her çar aliyên Kurdistanê tiştêkî berçavî ye. Têvgerên neteweparêzên Kurd ên heta vê demê afirîne, bi xurtî neçûne ser vê nexweşiyê. Lewre her dem jar û lawaz mane. Pişt re jî, ji holê rabûne û winda bûne.

Di dîroka tevgera rizgariya Kurdistanê de, tevgera ku

vî tiştî, weke pîrseke bingehîn girtiye dest, PKK bûye. Anku riya xwedîbûna encumen û meclîsên neteweyî yên ebedî, serteser, ji pêkanîna yekîtiyêke xurt a civaka Kurdan derbas dibe. Em dibînin ku Kurd di vî warî de, di refên têkoşîna PKK'ê de, gavekî baş avêtine. Lê mixabin, hîna jî, di vê guzergahê de, me, gelek rê divêt. Em dikarin bi wan nexweşiyên xwe, zanetî, nezaneî bibin navgîn û alavên kerîkirina dijminan. Em nabêjin, va ye PKK'ê têkoşîna me evçend pêş ve biriye, em jî wê bi gaweke din, pêşvetir bibin. Nexweşiyên civakê û kêmasiyên di kesaniya me de, me, bi zanetî-nezanetî dike navgîn û alavên dijminan. Em bi destê xwe mala xwe wêran dikin.

Ji ber vê hindê, me şiyar-bûneke xurt divêt. Divêt ku em kûr û hûr bihizirin. Divêt ku em bîra riya dûr bikin. Em ji gehînekeke awarteyî derbas dibin. Ev cenga rizgariyê ku li dijî talan û dizîya nîrx û hebûnên Kurdistanê berz (xurt) bûye, pêwîstiya wê bi her derfetan heye. Nexweşîya korbûn û başnedîtina ku dijminan di nava me de belav kirine, nahêlin ku em xwe bi tundî li erk û wezîfeyên xwe ragirin. Ev nexweşî, bi hezar cure û babetan xwe li ser me nîşan dide. Yek ji van nexweşîyan zikreşîya me ya li ser heval û hogirên me bi xwe ye. Em bînin bîra xwe ku, dijminan, her bi vê nexweşiyê, me ji yekîneyên (birim) me yên herî biçûk de jî, ji hev xistine. Dû re karîbûne dest dahênin (deynin) ser vî welatê dewlemend û serwest. Ma em ji dema feodalîya Osmanîyê û sermayedariya Îngilîz û Fransa de, bûne çend parçe? Pîrsa herî mezin: Û hîna dilê me heye em bibin çend parçe?

Em di van rojên watedar ên rojên li berbangaya meclîsa niştimanî de, bi xurtkirina hevgerêdana nava xwe ye, li ser rûyê dijminan vê yekê biqirin: Em di Meclîsa Neteweyî de Yekîtiya xwe perçîn bikin!



Zarokên doh, qomutanên îro...



Di sala 1853'an de roja 30'ê Adarê, wênesazê Holandî yê navdar Vincent Willem Van Gogh hatîye ser rûyê dînyayê. Van Gogh, ji xeynî wênesaziya xwe ya bê hempa, bi aliyê xwe yê ne ji rêzê û anormal fê nas kirin. Mirov dikare bêje ku Van Gogh, di nav hemû hunermendên dînyayê de, yek ji yên herî balkêş û awarte ye. Mirovêki wisa awarte û cihêreng e ku carna bi destê xwe ceza daye xwe; xwe derxistîye derve û bi saetan di nav berfê de sekinîye, carna nivê havînê, bi taybetî li ber tava ku mirov dişewitîne, dîsa bi saetan rûniştîye û wêne çêkirine û her wekî din... Lê ji van hemû bûyeran balkêştir û anormaltir jêkirina guhê xwe ye; tê gotin ku wî bi destê xwe guhê xwe birîye û dû re li ber neynikê wêneyê xwe çêkirîye. Van Gogh, bi nameyên ku ji birayê xwe Theo re nivîsandine ji tê naskirin. Em di van nameyan de hezkirina wî ya ji bo Theo ji dibînin. Danaskirina Van Gogh, helbet bi çend gotin û wêneyan ne mumkun e, lê ji bo destpêkê em nameyê-ke wî bi Kurdî diweşînin. Di vê nameyê de ne bi temamî be jî, awayê nêrîna wî ya der heqê jîyanê de xwe dide xuya kirin.

Van Gogh: Ji Theo re name

Hin mirov hene, ji ber tembelî û qelsiya kesayetiye, ji ber nexweşiyên xwe yên giyanî bi kêrî tu tiştî nayên. Ger tu min wisa dibînî, tu dikarî min jî yek ji wan kesan bihesibînî.

Lê hin mirovên din jî, yên ku ji ber hin sebebên din bi kêrî tiştêkî nayên, hene. Mesela, hin kes hene ku bi rastî, ji dil û can dixwazin bi kêr werin, lê ji ber ku tiştêkî destê wan nayê û ji ber şermokahiya xwe û nexwedibûna taybetiyên afirandariyê an jî belkî jî, ji ber bextreşî û bêsiûdiyê, bi tu awayî nikarin bi kêr werin; mirovêki wisa, ew bi xwe jî nizane wê çi bike, lê beryê hişmendîya xwe wiha hîs dike: Ez rewşa xwe dikarim binirxînim, rewşa min ne xirab e. Ez dizanim ku ez dikarim bibim mirovêki bi temamî cihêreng. Divê ez bi çi ve mijûl bibim, ji çi re xizmet bikim? Di dilê min de tiştêk heye, lê çi ye? Ev, cureyekî nebi kêrhatîne ye.

Ger tu dixwazî, tu dikarî min yek ji wan bipejirînî.

Dema bihar tê, çivîka di qefesê de zane ku dikare bi kêrî tiştêkî bê û pêwîst e hin tiştan bike. Sebeba vê çi ye gelo? Bi temamî nikare xwe bi ser hev ve bide. Ramanên xerîb jê re çêdibin. Ji xwe re wiha dibêje: "Çivîkên din ji xwe re hêlin û lîsan çêdikin, çivîkan derdixin û mezin dikin". Dû re, serê xwe li çitên qefesê dixê. Qefesê jî şûna xwe nalebite, lê çivîk ji ber êşa xwe nehiş dibe.

Çivîkên ku difirin yek ji wan dibêje: "Ka hûn li wê ya bikêrhatî meze bikin, ev cureyêkê rantîye ye." Lê çivîka girtî jiyana xwe didomîne û namire. Hêl bû ku tiştê ku di dilê xwe re derbas dike, ji der ve nayê ferq kirin; rewşa wê têra xwe baş e û hetta, di ronahiya rojê de bi kêf e jî. Dawî, dema koçberiya çivîkan tê, xemgîniyêkê pirr dijwar dilê wê digire. Zarokên ku ew di qefesê de xwedî dikin, dibêjin ku hemû lazîmiyên wê hene. Lê belê dîsa jî ew li asîmanê bi bahoz dinêre

û hêrsa xwe ya li hember felekê di dilê xwe de dijîne û wiha keserê dikişîne: "Di qefesê de me, erê ez di qefesê de me û tu kêmasiyên min jî nîn in, bê mejîno! Hemû pêdiviyên min hene, lê ji bo Xwedê ez ji azadiyê pêştir tiştêkî din naxwazim, ez jî dixwazim weke çivîkên din azad bijîm."

Mirovêki bi wî şekî nebi kêrhatî dişibe wê çivîkê.

Tiştên ku mirovan di nav çar diwaran de, weke binaxkirina kesên bi can, digirin û derdora wan çeper dikin çi ne, nayê zanîn. Tiştê tê zanîn ew e ku, mirov dizane ku derdora mirov bi diwaran, bi çeperên tê û bi caxên hesin nehatiye girtin, mirov ji hebûna wê çeperê haydar e.

Gelo ev tişt giş saw û xeyal in? Bawer nakim. Û mirov ji xwe dipirse: "Wey Xwedêyo, ev rewşa demdirêj ebedî ye û di serê herkesî re derbas dibe."

Gelo tu dizanî ku girtîgeh hemû meylariyên mirovên xurt û cidî wînda dike. Dostbûn, birabûn û hezkirin; girtîgehê hebûna van hestan bi sehrên xurt û bi dijwariyêkê bi hêz dide diyarkirin. Kesê ku nikare bibe xwediyê van hisan, ji xwe re dimire.

Lê cihê ku evîn û hezkirinê lê dizê, li wê derê jiyana nû ve dest pê dike. Carna girtîgehê dibe cihê pêşdarazî, çewt têgihîştin, bêitîmadiya cahilî û fedîtiyên çewt.

Em derbasî babeteke din bibin: Ger ez xeriqim, tu bilind bûyî. Ku min, tiştên bala min dikşînin, wînda kirin û te hin tişt bi dest xistin. Ez jî wê dixweşim im û ev heqîqeta tazî wê her dem kêfa min bîne. Ger tu wiha ne cidî bûya ne xwedî karakterêkî xurt bûya, ezê bitirsîyama ku tu xwe ranegirî. Bes ji ber ku ez dizanim tu xwedî karakterêkî cidî û saxlem î, ez dixwazim bawer bikim ku tê bikaribî xwe ragirî. Lê ger tu di kesayetiya min de, ji kêrhatiyekî cure xirab pêştir, tiştêkî din dikarî bibînî, ezê pirr kêfxweş bibim.

AZADÎ

Abdurrahman Durre



Şirhod û mûk*

L i gundê me (Kêranlixa Melazgirê) Mistê Xanê (rehmetî) hebû. Digot: "Ez bi apê xwe yê Hecî Mihemed re, tevî karwanê gund diçûm Bilîsê (Bedlîsê). Karwanê me li biniya gundê Karmûçê bêhna xwe da. Em çûn nav gund, ku ji xwe re nan û zad bînin. Ji me re gotin; "herin filan malê, ew mala mezinê gund e, çi ji we re lazîm be, wê bide we." Xelkê gund hemû File (Îsewî) bûn. Pirr camêr û mêvanperwer bûn." Mistê rehmetî digot: "Em çûn wê malê. Mêr li mal tune bûn. Harsikek (keçek) bi tenê hebû." Pirs kir, got: "Hûn çi dixwazin? Me got:" "Em karwan in, nan û xwarinê dixwazin. Got:" Hûn file ne, ya musulman in?

Me got: "Em **Hikûmeta Demirel û Erdal jî, mîna Mistê rehmetî, çiqas tev didin, ewqas dilewitînin. Hem jî lewitandineke qirêj û berbat. Ditirsim ku Erbakan Xoce jî, hêrs bibe û şirhodê bişkêne, yekî bike heftê helandî... wî wextê tu mêze bike li kêfa xweş...**"

zîn, tijî dimis

û nan anî û li ber me danî, got: De kerem bikin.

Em ketin ser û me xwar. Min ji apê xwe yê Hecî Mihemed re got: "Apo; ev file çiqas baş in û mêvanperwer in. Xwezil musulman bibûna. Ezê ji harsikê re bibêjim." Apê min bi min re xeyidî, got: "Ji te re çi lazîm e, nanê xwe bixwe û rabe, Lê belê, min bi xebera apê xwe nekîr, ji axçikê re (harsik, axçik-navê jin û keçikên fila ne) got:" Hûn çiqas merd û camêr in ku ewqas dims û nan didin karwanan, xwezil hûn musulman bibûna." Axçik ji min pirs kir: "Navê te çi ye?" Min got: "Mistê ye. Got: Kirîvê Mistê; mişk ketibû nav kûpê dims, tê de mirar bûbû, me anî ku em birijînin, mezinê me gotin, musulman dixwin, merijînin, ku hatin mêvaniyê bidine wan." Ku wê wilo got, ez hêrs bûm û min hîncan li erdê xist û parçe parçe kir. Harsikê li çokên xwe xist, fîzar kir û got: "Kirîvo te çima şirhoda diya min şikênd?" (Şirhod navê mîzdankê ye ku bi tirkî jê re dibêjin: Levazîmlîk. Yânî firaqa ku mirovên şil û şatî tê de mîz dikin.)

Mistê rehmetî digot: "Ku harsikê wilo got, apê min ê rehmetî sîleyek li min xist û got: "Dînikê ser-serî, min ji te re negot tev nede, tu çiqas tev bidî, dê ewqas bilewite, te safî kir û çû. Hem dimsê ku mişk tê de mirar bûye, hem jî hîncana ku şilhod û mîzdank e, derket meydanê. Em wisa pîs û necis bûn ku, çemê Mûradê jî me paqij nake."

Hikûmeta Demirel û Erdal jî, mîna Mistê rehmetî, çiqas tev didin, ewqas dilewitînin. Hem jî lewitandineke qirêj û berbat.

Ditirsim ku Erbakan Xoce jî, hêrs bibe û şirhodê bişkêne, yekî bike heftê helandî... wî wextê tu mêze bike li kêfa xweş...

* (Mîzdank û mişk)

Gelo ma ev şanê doktoriyê ye!

Memo Dekşûrî

Rewşenbîr di avakirina raman û hizrên nû û hemdem de cihêki bi qîmet distînin, çimkî ew in yê bêtir ji hinek ên din agahdar. Li ser çavkanî, jêza û jêderên pêşketinê ne û bi êş, kêr û çewtiyên civaka xwe nasdar in, ji lew re her tim û li her cihî dibîne pira selatê ji bo ku gelê xwe bigihînin buhiştê rengîn. Ev bûyer pîrr seyr e û hêja ye. Lêkolîneke pîrralî û zanistî ye. Ev xebata rûmetdar ji pisporiya civaknas, dîroknivîskar û siyaseta-menda ye. Ji ber ku ev kategoriya xwedî rewşenbîriyê kûr û zanebûneke pîrr bilind e.

Kategoriya aqil û hişmend "doktor, endîzyar, mamoste, helbestvan û nivîskar" bi giranî ji bo xwe dîrxistinê ji têkoşinê dibêjin "Em bi serê xwe ne û bi tu rêxistin û partiyên siyasî ve ne girêdayî ne." Xem nake em heya vê xalê bi wan re ne, lê belê kesê serbixwe be jî, xwe berpirsiyar dîtin li pêş mîlet û welatê xwe, tê wateya pêkanîna erk û delametên welatparêziyê. Dema em jê dipirsin ka çiqasî van xalên pêk tîne û heya kîjan seviyê xwe girêdayî bi gelê xwe dibîne. Bersiva wî wiha ye: "Ez ne siyasî me û ev karê hûn ji min dixwazin karê rêxistin û partiyên siyasî ne." Em bi karê xwe, xizmeta gelê dikin. Lê xwezî we zanibûya çî xizmet û alîkariyê dide mîletê xwe.

Xizmeta we ya herî bi rû-

met tijekirina berikan, tazîkirina mîlet û mijandina xwîna wî ye: Heger tu alîkariyêke biçûk jî, ji wan dixwazî, yan dibêjin, 'em nabin' yan jî dibêjin, 'bawerîya me bi we nayê'. De were bi van re debûr bike û wan bihişmêre ji rewşenbîrên xwe, ev ne kar e, ne emel e!

Di nav vê kategoriyê de em dixwazin li ser pişeka doktoriyê rawestin û kesaniya wan lêkolîn bikin, çimkî îro di civakê me de, ne tenê nexweş pîrr in, lê bêtir, ji nexweşan bi-jîşkên me jî nexweş in. Di fikrê û ramanên xwe de nexweş in û ev malkambaxiyê herî mezin e. Ev sendromeke herî xedar û bêçare ye, çimkî dema ku doktor nexweş be, nexweş tu carê saxlem nabe.

Doktor-nivîskarê Rûs ê bi nav û deng Çêxov dibêje: "Doktorî karekî mezin, xwegorîkirinê û paqîjiya ramanê dixwaze. Doktor divê zelal be, divê bi hişê xwe, bi moralê xwe li hevhatî be."

Erê nivîskarekî wiha mezin û doktorekî, bira çima van tiştan bi lêv dike û tîne zimên, çî sûd û qezencan jê werdigire, çima nedigot "ez doktor im û hema bes e" her kes ne weke me çavgiştî ye û dev ji nîrxên xwe yê mirovhezî û neteweyî ber nade ji ber tiştên biçûk, di Kurdistanê de çend doktoran xwe fedayî welat kirîye û bûne nimûneyên hêja ji bo gelê me, em dikarin wan bi tiliyên destan bijimêrin, çima Kurd wilo kurdûnde ne. Ma ew şîrê dayî-

kan, heram çû!

Mebesta Çêxov bi xwegorîkirinê û paqîjiya moralê çî ye? Bi taybetî li welatê me Kurdistanê, gotinên wî çawa wê bîne wergerandin, doktor berî her tiştî mirovhez e. Gava tu dixwazî nexweşiyên çareser bi-kî divê tu însanperwer bî û bawerpê bî. Rastbûna ramanê û hizran di laşên saxlem de ye ne di yê nexweş û azardar de ne, di vir de em nîşanê dikin ji tevan re ku, armanca dawî ji hemû doktoran re rastramanê kirin e.

Doktor berî her tiştî divê doktorê civak, mîlet û însanê xwe bin. Bi gotineke din, civaknas, miletêz û însanparêz bin, xweşiyê doktoran di welatêkî bindest de nîn e. Garantî

û misagoriya jiyana wan tune ye. Îro nebe wê sibe bibe gepa devên wan seg û guran, ji birnekin berî em xwe doktor bihesibînin dijmin me Kurd dibîne, çekê wî û hêzên tarî karê me nas nake, ji axê bigire heya dar û sewalên me dişewitîne, ji bo ku me bibizdîne û me ji neteweyîtiyê dûr bixe, dixwazê em her tim koçer, penaber û nexweş bin, hêviya gelê me jî îro hûn in, ma heya kengê wê dijmin bi me bilize? West dereng e û dem pîrr teng e. De rabin doktornê, îro roja rûmetê ye, ma N.Dêrsimî ne doktor bû, çima ew penaber bû, ma Dr.Keşdal ne doktor bû, çima ew kuştin, ma Zekiye Alkan nedixwest kilînikê xwe veke û li mîletê xwe bimêje, çima xwe şewitand? Êşa herî mezin a civakê me ye. Ma qey van doktor-gorbihuştan dizanibûn wê bê dunde herin gorê!

Doğan Güreş madalya dide mêrkujan

Ahmet Baraçkılıç

Gotineke bav û kalan heye, tê gotin: "Hinek hene ji canê xwe dibin ji xûyê xwe nabin." Mêtîngêkarên Tirkên jî, ji canê xwe bibin, hîn ji xûyê xwe dibin. Ber ku bê xwe, kesî nabînin, ger bibînin jî, xwe li pêş, li ser her kesî re, zana, mêrxas, demokrat, aştişwaz û şervan dibînin.

Di dîrokê de, jiyana xwe tenê bi hovîti, karîbûne bîdomînî, bi vê hovîtiyê jî, tim xwe dipesînînin û bi komqir-

kirina gelan xwe serbilind dibînin, dibêjin: "Me çiya qelişandin, behrê (deniz) bi hespan derbas kir, gemî di reşê de meşand, bi şûr, di yek carê de serê heft kesan qut kir, ji Efrîka, Asya ta Ewropa zêft kir. Gelê Ermenî, Rûm, Kurd û hwd. gelek pelixandin."

Di sazûmaniya Tirkîyê de, hemû paşa, mîr, serok, serbaz û general bi zîlm û tadayê, bi kuştin û ramaniya nijadperestiyê gihîştine van wezîfan, bi vî awahî bûne, paşa û her tişt. Sazûmaniya wan jî, bi vî awahî hatiye da-

mezirandin û hin bi vî awahî jî tê domkirin, ta ku ji canê xwe bibin.

Gelê me, ji destên wan gelek kişandiyê, me hemûyan (tevan) jî hovîtiya wan diye û dibînin.

Tiştên ku me nedibû û nebihîstibû: Sazûmanekî xelatê, madalyayê bide kesên gelkuj. Me van jî, ji kedxwarên Tirkên dît. Mete Sayar bi Şîrnex re gelek gund û war hilweşand, wêran kir. Ser sedirê Kurd kuştin bi sedan jî, di bin lêdanê de derbas kirîye, ev kes ji bo vî yekê ji alî Do-


ğan Güreş ve madalyaya serkevtinê distîne. Serbazê leşkeran Ömer Bulu jî, bi nezaniye çîçe pêlî bombê dike, nigê (qora) wî parçe dibe, ev kes jî madalyaya bêtirsî û mêrxasiyê distîne. Ji îro pê ve baş hatiye diyarkirin ku, kesek Kurdekî dikuje peşan distîne, madalya distîne. Dewleta Tirk wilo ye, madalyê didin qetilkaran, didin xwînmijên gel.

Bê guman, gelê me jî, bi çî awahî xelatê dide wan baş dizane, di bêrsivê de gumana min tune, ewê bête dayîn jî.

XACEPIRS

Amêdekar: Rasto Zîlanî

Çeperast: 1-Rewşenbîr, zanyar û helbestvanê Kurd. Di sala 1908 an de ji dayika xwe bûye. Ji ber zilma dewleta Romê koçberê Ermenîstanê kirîye. Demek dirêj serokatiya dibistanên Kurdî kirîye. Tevî zarokên xwe, weke malbateke bi nav û deng tene naskirin. "Elegez" û "Rojên Min" navên du pirtûkên wî ne. Mamosteyê hêja di wêne de tê dîtin.
2-Pêxemberê fileyan/ Lihevhatin, sulh/ Sembola Sifirê 3-Hespê nû zinkirî/ Li hêla Xerzan navekî mêran 4-Nexweşînek/ Ban, bilind 5-Îrade/ Eroin jê çêdibe/ Sembola Sîlîsyûmê 6-Ji agir dikişê/ Bi Tirkî xwendina erxê 7-Seyda 8-Li Misra kevin navê yezdanek/ Di klamên Kurdî de navekî mêran 9-Nîşan 11-Bi Soranî lê/ Poran rast dike.
Serejêr: 1-Zamîr/ Yezdan 2-Li Mezopotamya navê gelek/ Hoste pê diwaran siwax dikin 3-Sazî, awahî/ beyreq 4-Navê rojek/ Zanyar, alim 5-Çêlek/ Xelk, herkes 6-Jan/ Bi Erebi pêkanî/ Bi Tirkî kûçik 7-Tîpek ji elfabaya Erebi/ Yekîtiya rewşenbîrên Kurd 8-Li gundan digerin û tiştan difiroşin/ Menzel 9-Rawestîngeha keştiyan 10-Di notayê de dema seknê 11-Lîstokek, li dest 12-Mîrov li piyên xwe dikin



BERSIVA XACEPIRSA HEFTIYA ÇUYÎ

Çeperast: 1-Îqbal Hîcabî 2-Terzî/ Secere 3-Aş/ World/ Şad 4-Leven/ Awa/ Na 5-Îmar/ Ame/ MIT 6-Link 7-Ka/ Üso 8-Er/ Ajans 9-Berzencî 10-Aşvan/ Em
Serejêr: 1-Îtalîk/ Eba 2-Qeşem/ Kreş 3-Br/Vala/ Rv 4-Azwerî/ Aza 5-Lion/ Nûjen 6-Aksan 7-Îslam/ Oñce 8-Cedwel/ Sim 9-Ac 10-Beş 11-Îranî 12-Edat

KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiye razîn:

Li Tirkîyê û li derve: Y. Serhat Bucak

İş Bankası Çağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevli kopyeke pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

Navnîşana Welat: Başmuship Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 Çağaloğlu /İstanbul

Tel (fax): 512 12 87

Mercên abonetiye:

	Li hundir	Li derve
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM

Em bi hev re hîn bibin

3

ZAROKÊN SERHILDANÊ

ABCÇDEÊFGHIÎJKLMNOPQRSŞTUÛVWXYZ
abcçdeêfghiîjklmnopqrsştuûvwxyz

Van navên jêr hîn bibe-2

PIRTÛK




pirtûk

QAJIK




qajik

ROJ




roj

STÊRK




stêrk

ŞEWQE



şewqe

TEŞÎ




teşî

USKERE



uskere

ÛD




ûd

VARIK




varik

WERÎS




werîs

XOX



xox

YEMENÎ




yemenî

ZAROK




zarok

AŞ



aş

BERX



berx

CEWRİK




cewrik

ÇAV



çav

DERZÎ



derzî

KIJAN RAST E?

Bizin çî dixwin?

- () Bel
- () Gel
- () Pel

Newroz:

- () Di 20'ê Adarê de ye
- () Di 21'ê Adarê de ye
- () Di 22'ê Adarê de ye

Dûyê tendûrê ji ku dertê?

- () Roj
- () Rojîn
- () Hiv

Alfabeya Kurdî çend tîp in?

- () 29
- () 30
- () 31

Navên tiştan bi xêzekê bi hev re girê bide!

- birrek
- çakûç
- mix
- texte
- rende
- metre

Kijan gotin ê kijan pişeyî ye? Li bin binivîse!

Hesinker	Berber	Aşpêj	Mamoste

pênivîs, çakûç, cawbirr, kevçî, çetel, jêbir, hesin şeh, neynik, aqûşxane, xwê, kaxez, qicqac, rûn pola, bervang, kêr, birinc, mengene, das pirtûk, çente, rastkêş, defter, gulav, sawûn

BEREVAJÎ

Peyva rast li cihên vala binivîse!

Av sar e.	Avgerm..... e.
Hewa germ e.	Hewa.....e.
Ez birçî me.	Ez im.
Ez naçim.	Ez
Ez ne di xew de me.	Ez im.
Ez nexweş im.	Ez im.
Ez dirêj im.	Ez im.
Porê min kurt e.	Porê min e.
Ez nabînim.	Ez.....
Ez qelew im.	Ez im.
Ez reş im.	Ez me.
Ez xirab im.	Ez im.
Ez ne jîr im.	Ez im.

Weşanxaneyên Kurdî hêdî hêdî dev ji weşanên Kurdî berdidin. Pirtûkên Kurdî nayên firotin.

Xwendevan li Kurdî xwedî dernakevin

Xwendevanên Kurd li zimanê xwe çiqas xwedî derdikevin? Pirtûkên bi Kurdî çiqas tînin firotin? Heta niha çiqas pirtûk derketin û belav bûn? Weşanxaneyên Kurdan ji bo çî dev ji weşanên Kurdî ber didin û pirtûkên Tirkî çap dikin? Nûçevanên Welat li bersiva van pirsan geriyan. Li dawiyê tabloyeke enteresan derket.

Mem û Zîn.... Evîna Welat, Dîroka Kurd û Kurdistan, Incîla Luqa, Destpêka Ebebiyata Kurdî...

Erê.. Ev pirtûk û hin pirtûkên weke van tev bi zimanê Kurdî hatine weşandin. Îro ev navên ku di rastiya jiyane de bûne pirtûk belkî deh pazdeh sal berê, di hişên gelek kesan de ji xeynî utopyake delal pê ve ne tiştekî din bûn. Lê îro bi geşbûn û pêşveçûna têkoşîna rizgariya li Kurdistanê re, rê li ber zimanê Kurdî vebû û ev pirtûk li pey hev hatin weşandin. Her çiqas serê ewilî ev pirtûkên li ser Kurdan, ji aliyê weşanxaneyên Tirkî ve dihatin weşandin jî, di van salên dawî de bar bi temamî ket ser milên weşanxaneyên Kurdan. Û ji vir û pê ve, pirtûkên bi zimanê Kurdî jî hatin weşandin. Di vê pêvajoyê de, ev weşanxaneyên Kurd bi pirranî di warê dîrok, wêje (edebiyat) û hunera Kurdî de bi zimanê Kurdî û Tirkî, dest bi weşanên pirtûkan kirin.

Lê belê ji ber qedexebûna 70 salî ya zimanê Kurdî û tunebûna saziyên perwerdehiya zimanê Kurdî û di encamê de hindikbûna kesên ku bi zimanê Kurdî zanin bixwînin û binivîsin; pirs-girêkên girîng derxistin pêşiya weşan û weşanxaneyên Kurd.

Ev pirtûkên ku piştî 70 salî bi Kurdî hatin weşandin çiqas eleqe dîtin? Pirs-girêkên weşanxaneyên ku van pirtûkan diweşînin çî ne? Ev pirtûk bi pirranî li ser çî babetan disekin û çiqas tînin firotin? Me ev pirs meraq kirin û ji bo xwendevanên xwe lêkolîn û lêgerîn

çêkirin. Weşanxaneyên ku me bi wan re hev dîtin çêkirin û li ser van pirs-girêkan me dîtinên wan standin ev in:

Weşanxaneya Koral:

Di sala 1974 an de dameziri. Heta niha 100 pirtûk derxistine, ji van 25 heb li ser Kurdan bi Tirkî û Kurdî

hatine nivîsin. Neh heb ji van bi Kurdî ne. Koral di nav weşanxaneyên Kurdan de ji hemûyan zêdetir bi Kurdî pirtûk weşandiye. Pirtûkên xwe di navbeyna 2000-3000 adefî de çap dike.

Pirtûkên wan ên bi Kurdî ev in:

- Birîna Reş : Musa Anter; Edebî

- Çirokên Kurdan: Selaheddîn Mihotolî; Berhevkin

- Siltan Selaheddîn û Malbata Wî : Torî; Dîrok

- Gramera zimanê Kurdî: Qanatê Kurdo; Gramer

- Dîroka Kurd û Kurdistanê: Aso Germiyani, A. Tigrîs

Berhevoka Kurdî: Stig Wikander; Berhevkin

- Qeydan Kevin Kir Mîn Ji Hesreta Te: A. Arif; Helbest

Ferheng: Torî

Kula Dêrsimê: Felat Dilgeş; Şano

Pirtûkên bi Kurdî nêzîkî 2000 î tînin firotin. Ê bi Tirkî 5000 tînin firotin. Weşanxaneya Koral, di bernameya xwe ya îsal de wê giraniya xwe bide ser weşanên Kurdî. Armanca wan pêşxistina zimanê Kurdî ye.

Weşanxaneya Doz: Di sala 1990 an de dameziriye.



KORAL



Gelek weşanxane pirtûkên bi Kurdî derxistin. Ji ber ku zêde nefirofîn hinek ji wan dev ji pirtûkên bi Kurdî ber dan.



DOZ

Heta niha 21 pirtûk derxistine. Tev jî der heqê Kurdan de ne. 7 heb ji van bi Kurdî hatine nivîsin. Di pêşerojê de êdî zehf wê li ser weşandina bi Kurdî bisekinin. Pirtûkên xwe di navbera 3000-5000 î de çap dikin. Nêzîkî 1500 heb, ên bi Kurdî tînin firotin. Ên bi Tirkî jî Kurdî zehftir tînin firotin.

- Gremara Kurdî, E. C. Bedirxan, R. Lescot; Nîvî bi Kurdî nivî bi Tirkî.

- Danezana Gerdûnî ye Mafên Mirovan

- Zimanê Çiya: Harold Pinter; Şano

- Bi Kurdî navên Zarkan: Yusuf kaynak; Berhevkin

Siya Evîne: M. Uzun; Roman

- Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê: M. Uzun; Roman

- Li Kurdistanê û Rojhilata Navîn Çekên Kimyayî, Biyolojîk: Dr. Celadet Çeliker

Weşanxaneya Beybûn: Di sala 1991 an de dameziriye.

Beybun Yayınları

Heta niha 5 pirtûk û kovarêk bi navê Nûdem derxistine. Pirtûkên wan tev der heqê Kurdan de ne, lê ji van 2 heb tenê bi Kurdî hatine nivîsin. Ev herdu jî roman in. Kevoka Spî, Ferat Cewerî, Destpêka Edebiyata Kurdî jî Mehmet Uzun nivîsiye. Pirtûkên wan ên bi Kurdî 2500-3000 tînin firotin. Wê di pêşerojê de li ser weşanên Kurdî bisekinin lê ger kêmbûn firotin dibe ku dev ji weşanên bi Kurdî berdin jî.

Weşanxaneya Öz-Ge:

Di sala 1992 an de dameziriye. Heta niha 11 pirtûkên wê hatine weşandin. Pirtûkên wan tev der heqê Kurdolojiyê de ne. 3000 heb çap dikin, yê bi Tirkî jî ên bi Kurdî zêdetir tînin firotin. Di programa wan a pêşerojê de weşandina pirtûkên bi Tirkî wê ji yê bi Kurdî pirtir bin. Sedama vê jî, bi kêmbûna kesên xwendan û nivîsandina bi Kurdî ve girê didin. Lê dîsa jî, wê li ser weşandina bi Kurdî bisekinin. Niha jî



pirtûkeke wan a bi navê Rojnamegeriya Kurdî li ber çapê ye. Nivîskarê wê Malmisanij û Mahmut Lewendî ne. Herdu pirtûkên din ev in.

Klam û Stranên Kurdî: Mehmet Bayrak, Tarîxa Edebiyata Kurdî: Qanatê Kurdo.

Weşanxaneya Deng:

Di 1989 an de dameziri û dest bi weşandina pirtûkên bi

Kurdî kir. Heta niha 8 pirtûk derxistine û tev der heqê Kurdan de ne. 4 ji van bi Kurdî hatine nivîsin. Pirtûkên wan ên bi Kurdî, nêzîkî 2000 hebî tînin firotin. Pirtûkên wan ên ku der heqê gramerê de hatibûn weşandin tev hatine firotin. Wê di pêşerojê de li ser herdu zimanan ji weşanên xwe biki.

- Dersên Zimanê Kurdî: Baran; Gramer

- Dawiya Dehaq: Kemal Burkay; Şano

- Sewra Azadî: Cegerxwîn; Helbest

- Du Ferheng derxistine. Yek ya D. İzolî bi Kurmancî û Tirkî ye, ya din jî bi Zazakî û Tirkî ye, ya Malmisanij e.

Wê bidome



• Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
 • Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
 • Navnîşan (Adres): Başmusaşip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 • Tel (fax) 512 12 87
 • Berpirsiyariya Ewropa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
 • Berpirsiyariya Fransa: Amed Jemo • Rua G-401 92763 Antony Cedex France
 • Çapkirin (Baskı): Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım AŞ